mîzah

MAHMÛD LEWENDÎ

Compûtera ber dilê min

www.kurdme.com
www.all-kurd.com
www.kurdefrin.com

www.nefel.com
info@nefel.com

NEFEL

Compûtera ber dilê min

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Compûtera ber dilê min

MAHMÛD LEWENDÎ

NEFEL
Stockholm
2002

www.nefel.com
info@nefel.com

Mahmûd Lewendî: Compûtera ber dilê min

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Mahmûd Lewendî û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-89687-09-4

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Wêneyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

Nêverok

Kurtepêşgotinek 9

Ne tayek lê çend tayên sipî 10
Mirin 12
Jiyan şorba nîska ye 14
Ez naxwazim guhê we bikşînim! 16
Camêr ji gundekî wekî gundê pîrika min hatiye 19
Paşgotinî – an jî bi gotineke din »dedîqodî« 21
Kêrtotirrekî 22
Beroş – aşxana servekirî 23
Tendûr şîrket 24
Dîsa reklam... 26
Qisê qorr - yanî gotinên hîç û pûç 27
Nesîhetek: mirov çawa li qahwê rûdine 29
Konferansek... 31
Kurteromanek: Of, of! 35
Romanek gelek kurt 36
Navê min Mûhemmed e 37
Pakêtek Marlboro 38
Kerê Mellê 40
Min go qey! 41
Te çima nekuşt 43
Ji dîwana Seyda Berde 45
Elvis Presley kurd derket 48
Rê û rêgayên menşûrbûyinê 51
Mêranî 53
Hero Hemê were vira 55
Zikê min diêşe 57
Pişika min a sipî ya alîyê çepê diêşe 58
Contens, contenu, inhalt, innehåll, ... 59

îçîndekîler, fêhrist û yên me...! 59
Tahlîla kelîmeyên kurdî 61
Çend peyvikên nû 63
Çîroka Adem û Hewê û zarokên wan Harbîl û Karbîl 64
Kaşkaşokapaşpaşokaserhesin 66
Compûtera ber dilê min xeyo lo lo! 67
Nîv-nameyek ji Mecîdê Haco 68
Serboriyek 70
Nameyek ji bo xwendevanan* 71
Çend name 74
Kontax yan jî qontax 78
Kurtejiyana min 80
Ji % 98-ê ronakbîrên me ji tirkî hez dikin 86
Dewleta kurdî ya federe û dewletên kûkla.. 87
Bira bira ye bazar cuda ye 88
Emê kengî li xwe mukur werin? 89
Li Ewrûpayê şeqîn û repîn e 91
Komela mêrên bindest 92
Yekîtiya nivîskar û yên ko bibin 93
nivîskarên kurd li Swêdê li dar ket! 93
Şerê abonman û neabonmanên Armancê 94
Kin û kurt bimre kovarmijî 95
Studia Kurdica derket! 96
Tirr kovareke nû 97
Tirs 98
Însan derewan dikin 99
Dewlemend û feqîr an jî feqîr û dewlmend 100
Ew kî ye li ser têlê? 101
Mehellîstan 102
Nûgörmîş û nûlixwehaydarolmîş! 103
Em û xelk 103
Ji me re qebehet e! 104
Parastina ziman û edeba kurdî 104
Çekîç gûç defol yan Tûrk ordusu defol? 105
Neh cumhûriyet û elfabeyek milletek û sê elfabe 105
Ecayîb 106
3 800 pakêt cixare!!! 107

Tiştê dûrî aqila 107
Zimanê me û yên xelkê 108
Ecaîbatên dunyayê 109
Ne gotinên navdaran lê yên nav daran! 110
Çend gotinên xweşik û gulover 111
Xelkê çi xweş gotiye 112
Navên kurdî 113
Ev weha lê weha çawa ye? 115
Çawa qoymîş kirine bila wisa jî çiqarmîş bikin! 117
Her babet belavok, name û mesajên hazir tên firotin! 118

Kurtepêşgotinek

Mîzah şaxeke edebîyata miletekî ye ko beşê herî balkêş e. Ger di civatekê de mîzah û rexneyên mîzahî tunebin, pêşketina wê civatê jî qels e. Mîzah jî wek gelek şaxên edebî û folklorî û mûzîkî, parçeyek ji neynika wî milletî ye ko di wê neynikê de kil û kêmasîyên xwe dikarin bibînin û xwe li gor wê rast bikin.

Ji derveyî pêkenîn û henek û laqirdîyên devkî yên folklorîk, çi bigre her millet xwedî mîzaheke nivîskî ye jî. Di her civatekê de bi destpêka derketina rojname û kovaran re, her weha kovar û rojnameyên mîzahî jî dest bi weşanan kirine. Ger em di edebîyatê de hicîv û rexneyên helbestkî nehesibînin, di edebîyata kurdî de mîzahê bi derketina rojname û kovaran dest pê nekirîye.

Yekem rojnama kurdî Kurdistan di 1898-an de derket û ji wê rojê heta îro li her çar parçeyên Kurdistanê û li derveyî welêt nêzîkî 1026 kovar û rojnameyên kurdan derketine. Di nav van rojname û kovaran de tenê pênc kovarên mîzahî derketine (*Mîrkut, Zengil, Îsot, Kovik* û *Tewlo*) ko wan jî piştî salên 1985-an dest bi weşanê kirine.

Di 1985-an de bi alîkarîya carcarî ya Eşref Okumuş, bi navê *Mîrkut* min kovareke mîzahî derxist. Di wê kovarê de di bin navên cihê cihê de min gelek nivîsên mîzahî û pêkenîn nivîsîn. Piştre di kovara Federasyona Komelên Kurdistanê *Berbangê* de bi navê *Sîrkut*, paşê li gel Mamoste, bi navê Tirşik me mîzaha xwe li wê domand. Û nuha jî di rojnama Armancê de bi navê Beroş quncikeke min heye ko tê de li gel pêkenîn û karîkaturan, carna hin çîrok an nivîsên mîzahî jî dinivîsim. A ev kitêb hinek ji wan nivîs û çîrokên ko di wan quncik û kovaran de cih girtine, hatiye amadekirin.

Mahmûd Lewendî

Ne tayek lê çend tayên sipî

Bi navê »tayek porê sipî« kurteçîrokeke Qedrî Can heye. Gava ko min xwend tesîreke pir mezin li min kir. Ez bawer im ger hûn bixwînin wê tesîrê li we -yên ko êdî salên wî nêzî 40-î ne- jî bike. Ew bi awayekî welê tarîfa wî tayê sipî yê ko di nav porê wî yê reş de derketiye dike ko çawa wek şûrkêşê ruhistîn li ser serê wî digere.

Herçendî li gor îrsîyetê ye jî, lê porê hinekan zûtir sipî dibin. Yan na di normala xwe de piştî 35-an êdî yeko yeko mirov di nav porê xwe de rastî çend tayên sipî tê.

Min 35 derbaskir. Îcar ne çend ta, belkî 30-40 tayên sipî di nav porê minê reş î qûl de wek nêrîyên pîvazên zîlavêtî yên nav baxçeyan, gişan serên xwe hildane.

Di destpêkê de yek-du ta bûn, min bi destan hildikişandin, yanê min zora wan dibir, lê paşê ez lê varqilîm ko te digot qey qereza wan bi min re heye, min tayek hildikişand, du tayên hê sipîtir li şûna wî tayî, hişin dihatin. Min nihêrt ko ez bi dest û pêçîyan di ber re dernakevim, îcar wek palîya genimê sor ko çawa meriv dide ber dasan, wele ez jî bi mûçingê ketim nav porê xwe û Xwedê go »yallah« û de bidê, ha ji min û ha ji wan, wele min koka wan qeland. Di nav wî porê min ê reş-î xweşik-î birqokî de ji bo derman be jî tayek sipî nema. Îcar kêfa min dihat. Ez ji wan xelas bûbûm.

Lê çi? Mehek di ser re derbas nebû, li ber eynikê min hew dît ko di şûna wan tayên sipî de îcar çend ta serî hil didin. Ya rebî ev çi bela bû? Her ko diçe jî zêdetir dibin. Welleh îcar jî min maqes girt û ez ketim nav porê xwe, yeko yeko min ew tayên sipî ji kok de birrîn, carna çend tayên reş jî diketin ber, lê tişt nabe, hêjayî wê yekê bû. Lê piştî demekê dîsa nebû. Ez çûm berber, min porê xwe hinekî kurt kir, tu nabê ew tayên sipî yên ko min bi maqesê ji kok de birrîbûn, hêdî hêdî serî hildabûn. Û malxerabê berber jî heta jê hat porê min kurt kir, anî qiyasa wan tayên sipî. Na, min nihêrt xelasî tuneye. Ez nîva-nîv teslîm bûm.

Nizanim ezê çi bikim?

Malmîrata rengê reş û sipî jî li ser serê merivan qet li hev nakin. Gerçî carna kêfa xwe tînim û dibêjim »de tişt nabe lo, hema bila neweşe, ji sipîbûnê re çare heye, ezê boyax kim«. Lê kanê ew cesaret. Ew cesareta ko tu rabî porê xwe boyax bikî û bi wê boyaxa reş a ko piştî demekê wê dîsa bibe binsipî, biçî nav hevalan. Na lo ezê boyax nekim! Îcar hûnê bibêjin »çima?«. Belkî jî hun nebêjin »çima?«. Lê ez jî nizanim çima?

Jin porê xwe boyax dikin. Hem jî bi awayên welê boyax dikin ko porê reş î qûl werdigerînin rengê zerî zerolankî. Carna nîv reş û nîv zer ko ew bi xwe di nav xwe de bi zimanê jinan jê re dibêjin »meç«. Yan jî porê xwe sor dikin, hinneyê tê didin, axirkê yanê ez serê we neêşînim tiştê nemayî bi serê porê xwe de tînin û em jî wek mêr qet dengê xwe nakin û bi ser de -ne ji dil be jî- em dibêjin »çi xweş bûye, çiqas li te hatiye, her tim weha boyax ke« û hwd.

Nebû, ne? Hun nuha dibêjin »ma ev jî sebeb e«. Baş e bavo, em dev ji jinan berdin. Em dîsa vegerin ser xwe mêran. Yan jî na na! Bisekinin ezê ji we re piçekî qala nexweşî û çareyên wan bikim. De îcar jî nebêjin »ma nexweşî û por?«

Nuha gava ko yek bi bapêşê bikeve ewê here doktor û wê hin dermanan bikire û bixwe ji bo ko ji wê nexweşîya xwe xelas be. Yan jî qezayekê derbaske û di wê qezayê de pozê wî bişkê, wê jê re derman bikin û pişt re jî wê pozê wî bi emelîyateke estetîkî jê re rast bikin. Yan jî diranê camêr ne sipî ne, diçe ser doktor jê re sipî dike. Îcar ê min jî porê min sipî bûye ez dixwazim herim ser doktorekî dakû reşbike. Ê de Xwedê hebînî ji viya normaltir çi heye, ko xelk ji merivan re dikin ecêbek giran.

Ero hun dibînin ne! Derdê min jî qet nayê kişandin!

(*Armanc*, no: 150, 1994)

Mirin

Mirin; çi gotineke ne xweş e, sar û tahl e. Grûzî bi canê meriv digre, meriv naxwaze navê wê dexî bîne ser ziman.

Berê mirin qet nedihat bîra min. Nuha jî nayê bîra min. Ez ji xwe re dixwînim. Digerim, diçim qahwê, bi dost û hevalan re radibim rûdinim. Em munaqeşe dikin, dikevin nava suhbetên dûr û dirêj. Carna dinivîsim. Carna mêvan tên, carna jî em diçin mêvandarîyan. Ez û jinikê şer dikin, carna jî em dikenin. Carna jî axaftinên li ser dahatûyê; vê mehê emê piçekî »îdarelî« bin, em bikaribin hinekî deynê xwe yê mayî bidin. Divê em mesrefa zêde nekin. Zêde telefonê bi kar neynin. Emê êdî wekî her carî neçin qahwê. Jinikê dev ji cixarê berda. Gerek ez jî dev jê berdim. Emê êdî zêde kitêb û kovaran nekirin. Bi vê wesîleyê belkî em bikaribin ji xwe re hinek pere berevkin daku bikaribin ji xwe re xaniyekî bikirin. An jî dahatuya xwe têxin bin garantîyê.

Li rojnamê dinihêrim. Li rûpela fala we, birca cêwîyan dixwînim: »Vê mehê tu di tengasîyê de yî, lê pêşde şansê te vekirî ye, mizgîniya xêrê heye. Ji alî evîndarîyê de tu bi talih î«. Wexta ko meriv bê hêvî be, an jî -di her awayî de- bê plan û program be, meriv hêvîya xwe bi birc û falan ve jî girê dide; yan jî pê sebra xwe tîne. Min bi xwe jî di gelek kovar û rojnameyan de rûpelê fala we an jî birca we nivîsîye. Û wexta ko min dinivîsand min qet bi teleskopê li stêrkan jî temaşe nedikir. Û min kitêbên fala jî nexwendîye. Lê kêm zêde meriv ruhîyeta mirovan dizane. Ji ber wê, tu çi binivîsî wê li hinekan were. Îcar ya herî xerab min bi xwe fala xwe nivîsandiye û dîsa ez bi xwe dixwînim û bi fala xwe hêvîyên min ên ji bo jiyaneke baş hê zêdetir dibin. Nizanim, mimkun e ko hûn bibêjin em ne welê ne, lê ez bawer nakim. Hela çend caran fala xwe di rojnamê de bixwînin êdî hunê jî piçek be bawerîyê pê bînin.

Lê malmîrata xeberên ne-xweş carna mala merivan xerab dikin. Yan di rojnameyekê de, an jî di televîzyonê de, te dî gotin: »filankes mir, 47 salî bû« yan jî »bêvankes mir, 57 salî bû« yan jî »mir, 67 salî bû«. A wê wextê ez pir difikirim. Ger 47 salî bimirim 8 salên min mane, ger 57 salî bimir-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

im 18 salên min mane, ger 67 salî bimirim 28 salên min mane. Îcar ji şansê min re kîjan!

Ev milletên Skandînavî çi şansê wan heye. Hema ji xwe re rojnameyeke Swêdî an Norveçî bigirin û li rûpela anonsa mirinê binêrin; 1897-1994, 1902-1994, 1906-1994, 1913-1994 û welê berdewam e. Û di binê anonsa wefata wan de jî:

»Tu hê wek guleke nûbişkivî ya buharê bû, te çima weha zû terka me da.-îmze: keça te Anita, nevîyên te Olof û Sten û nevîçirkên te Ulla û Karin û zarokên wan Anna û Karl«.

Camêr keça xwe, nevîyên xwe, nevîçirkên xwe û zarokên nevîçirkên xwe dîtîye, yanê çar neslên piştî xwe.

Kalikê min 104 salî bû mir. Bavê min 70 salî ye hê li ser xwe ye û cixarê jî dikşîne. Apanên min her yek 60-70 salî ne hê li ser xwe ne. Di malbata me de, hetta di nav eşîra me de -yên ko bi destê hukmatê hatine kuştin û yên ko bi qotikê mirine ne tê de- kes bi ciwanî nemirîye. Neku ez dilê xwe xweş dikim, lê te dî îrsîyet jî roleke mezin dilîze.

(*Armanc*, no:148, 1994)

Jiyan şorba nîska ye

Kela min rabûye, hewes û îlham hatiye, tam wexta nivîsandinê ye. Ma şalê zirre-zirra telefonê an jî pite-pita jinikê dilopan nekin daku hewesa min nereve! Hewes û îlhama nivîsandinê wek lottoyê ye, carna 48 kron ji mirovî re derdikeve, carna jî du milyon. Îcar înşellah a min ya du milyonî be.

Belê, ez dixwazim pêşî ji we re piçekî qala planên xwe yên nivîsandinê bikim. Plan û programa min a nivîsandinê bi qasî ya Wezareta Kulturî û ya Perwerdekarî ya dewletekê ye. Ezê ferhengekê derxim, piştre ezê ferhenga hemû lehceyan derxim. Paşê ezê antolojîya nivîskar û helbestvanên Kurdan derxim. Paşê ezê yeko yeko li ser jiyana wan binivîsim û peyderpey wek kitêb derxim. Piştre ez difikirim li ser malbatên Kurdên navdar binivîsim. Û min dest bi hemûyan jî kirîye. Hema hema bibêje min ji hemûyan hinek nivîsandine. Lê tu yek ji wan hê temam nebûye.

Do êvarê jî min dest bi nivîsandina jiyana Qedrî Can kir. Nêta min heye ez li ser jiyan û berhemên wî kitêbekê derxim. Lê min ew jî nîvco hîşt. Ji xwe va ye ev nivîsa ko nuha ez ji we re dinivîsim ket navbêrê. Lê bawerîya we hebe her çiqasî ez vê nivîsê dinivîsim jî, di heşê min de gelek tiştên din yên nû jî derbas dibin. Di 1983-an de min dest bi nivîsandina romanekê kiribû, nuha ew hat bîra min. Mumkun e ez dîsa dest bi wê bikim. Lê na welle pêşî divê ko ez kurteçîroka xwe xelas kim. Min kurteçîrokek pir xweş nivîsandiye. Navê wê jî »Manga Bi Ga« ye. Baş e, lê kovar? Ma ne min kovarek jî amade kirîye. Na lo kovar zehmet e. Perê min tuneye. Ji ko ezê hê rabim mehê carekê kovarekê amade bikim, bi perê xwe çap kim, dîsa bi perê xwe ji we xwendevanan re bişînim û hûnê jî ji min re nameyeke sipasîyê bişînin. Û ezê jî rabim bi ser de dîsa bi perê xwe nameyeke sipasîya sipasnameya we binivîsim û bişînim. Ûff ez aciz bûm.

Dîsa pite-pita jinikê! »Mahmûûûd, kanê me yê îro cil buşuşta!?« Bavê Nazê wexta diqeherî digot »Ezê kirasê xwe biçirînim!« De were neçirîne! Tam îlhama nivîsandinê hatîye, jinikê pêde pitpitand! Şuştina cilan ji ko

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

derket? Li vî welatê gawiran jî cilşuştin bi serê xwe derdekî giran e. Hê emê rabin cilên xwe yên qirêjî berevkin, paşê li gor yên bi reng û yên sipî ji hev derxin. Dermanê şuştinê û yê nermkirinê bigrin herin cilşoyê bavêjin makîna cilşuştinê, piştî saetekê derxin, di makîna guvaştinê de biguvêşin, paşê bavêjin makîna zuhakirinê, paşê derxin qat kin, dûz kin û bînin mal. Îcar li malê jî dîsa ji hev derxin, li gor cilan wan di dolaban de bi cih bikin. De xwedê hebînî yanê ne ez bim kî kane vî derdî bikşîne?

Xwezîka li gel kompitura xwe ez ji xwe re di heyamê însanên şikevtan de bijîyama. Qe nebe di heyamê wan de derdê cilşuştina wek îro tunebû.

»Mahmûûûd de hadê!«

Xwendevanino, wekî hun jî dibînin nahêlin em binivîsin. De bila vê carê jî wekî her carî nivîsa min nivco bimîne.

(*Armanc*, no:145, 1993)

Ez naxwazim guhê we bikşînim!

Em însan çi ecêb in! Tiştê ko di hişê me de ye, di nav dilê me de ye em nanivîsin, li şûna wê em diçin gotinên sînorkirî yên li gor civat û heval û dost û dijmin neqeherin wan dinivîsin. Ev jî di civatekê de ne tiştekî tebîî ye.

Hinek ji me radibin wekî ko tiştekî nû kifş kiribin, te hew nihêrt qala tiştekî welê dikin ko mirov ecêb dimîne.

Jinik pel pel li min dinihêre.

Xwendevanino, xuya ye we jî ji min fam nekir.

Ji xwe ez jî tiştê ko difikirim nikarim gişî raxim ser kaxezê. Wek fîlimekî di hişê min de derbas dibe, lê heta ko rêza pêşîn dinivîsim, malmîrata şerîta fîlmê ya di nav mêjîyê min de zû diçe. Îcar ez jî pê re nagihîjim, loma weha nîvco-qurço derdikeve.

Lê tişt nabe hema hûn jî nîvco fam bikin!

Belê, em li ko ma bûn.

Heqet ma min qala çi dikir?

Hi hii! Nuha hat bîra min; însan, însanên ecêb û ne ji dil!

Mêrik qey cara pêşî ye hêka dixwe, îcar radibe û rûdine dibêje »hêk, hêk tiştekî dûrî aqila ye. Gelo çima heval naxebitin ko hêka bixwin? Heta ko meriv hêka neke -pardon- nexwe mirov ji rewşa mirîşkê fam nake!«

De were ji navê derkeve!

Digotin »dînekî kevirek avêtîye bîrekê, çil baqilan nikarîbûn derxistana«.

Ji xwe xiyar jî buha bûne. Dilê min jî diçe cacixa bi sîr. Hema bila qe bîn ji devê min were. Waye li Hîndistanê erd hejiyaye; sî hezar mirî!

Ez dixwazim îşev romanekê binivîsim!

Ma kê bi te girtîye? Ji xwe tu nikarî îcar nezanî û bêhêzî ya xwe jî dixî hustîyê hişê xwe yê belengaz.

Na! Ne welê ye.

Hişê min ne belengaz e û ez ne bêhêz û nezan im. Lê Hz.Îsa li çarmîxa xistin. Xwîna ko ji kefa destê wî diherikî hê jî li ber çavên min e. Min di

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

televîzyonê de dîbû.

Xuya ye ez ditirsim!

Galileo jî ji mirinê ditirsiya.

Lê ez bêtir ji civatê ditirsim.

Civat ne wek mahkemê ye. Heqê xweparastinê nade te, nahêle tu ji xwe re abûqatekî jî bigrî. Bê taloq û bê ko lêbikole, di celsa pêşî de te mahkum dike. Muebbet an jî -bê ko fermana îdamê binivîse- te îdam dike. Yan jî endamekî xwe yî mirîd tayin dike, tê serê te ji laşê te difirîne. Ma kê çermê Hellacê Mensûr gura? Hesen û Husên ê nevîçirkên Ebdulmutalib hatin bîra min.

Law ev însanên me çiqas durû ne.

Li ber te xweş û geş dikin, li pişt jî, te dîn û bêhiş dikin.

Ez di redaksîyona Armanc û Wanê de kar dikim. Yek rojnameya mehane ye, ya din jî kovareke çarmehane ye.

Yekî çar roman derxistine. Min ya pêşî xwend, ez zanim ya çaran çawa ye. Ax ax, xwezîka mala me li gund buya, ez jî ji xwe re li ber golika bama.

Do êvarî jinikê hevîr kir. Hevîr tirş bû. Saet 19.30. Min televîzyon vekir. Li Moskovayê xanîyê parlamentoyê dişewite, 400 kes hatine kuştin. Yeltsîn demokrasîyê diparêze!

Ji oda din dengê jinikê: »hevîr tirş bû, wê di ser re biçe!«. Xwedê ji Yeltsîn re nehêle! Neyse saet di 21'ê de xeber hene. Perê min heba min ê makîna hevîr bikirîya. Xwezîka ez nuha li giravê Kanaryayê bama, minê xwe têr bida ber tavê. Ûff! Ev firina jî hema germ dibe ha!

Dîsa dengê jinikê »nan neşewite!«.

Nan û helaw hat bîra min.

Hundur germ e, ezê pacê vekim. Wîîî, baran dibare. Qiyamet nêz e.

Ez biçûk bûm, digotin berî qiyametê Diyarbekir wê bi avê xera bibe. Ez çiqas ditirsîyam. Xwezîka me mala xwe bibira bajarekî din.

Sylvia Plath 31 salî bû xwe kuşt, paşê bû nivîskareka navdar.

Ez xwe nakujim, emrê min ne 31 e, min eskerî jî nekirîye. Ji xwe ez dixwazim vê çîrokê temam bikim.

»Nan neşewite!«

Dengê jinikê ne xerab e; mezzo-soprano ye.

Xwezka Pavarottî ji gundê me ba.

Wê wextê minê bigota »Pavarottî yê Îtalî gundîyê me ye«.

Kî çi zane belkî jî gundîyê me ye. Ma di wexta Osmanîyan de ji gundê

me jî gelek mêr çûn seferberlikê, çûn şerê Balkanê, yek ji wan dibe ko ji şer reviyabe û çûbe xwe avêtibe bextê Îtalîyan.

Û tu ji yekî Swêregî re bibêjî pîrika min Swêregî ye, dikare te bikuje. Ji xwe »Tatarên Asya Navîn gava ko bixwestana mirovek biezimandana şîvê, diçûn mala wî û bêyî ko jê re tiştekî bibêjin guhekî wî dikişandin«.

Perê min tuneye ez naxwazim guhê kesî bikşînim.

Vê mehê çar kesan guhê min bikişandana wê çi xêreke mezin bikirana. (4/10/1993)

(*Armanc*, no:143, 1993)

Camêr ji gundekî wekî gundê pîrika min hatiye

Pîrka min a Etê di jiyana xwe de bajar nedîbû, îcar wexta ko me digot emê herin Swêregê, pîrika min a Etê digot:

— Ma Swêreg mezin e?

— Erê pîrê pir mezin e!

— Ma ji gundê me jî mezintir e?

— Erê, wîîî!

— Ma bi du qasî gundê me heye!

— Hê mezintir e, hê mezintir!

Pîrika min di jiyana xwe de tenê gundê xwe û çend gundên din ên Qerejdaxê dîtibû. Îcar muqayesekirina wê dê çawa be. Nufûsa Swêregê 80 hezar e û ya gundê me jî 800 e. Û pîrika min jî dikare tenê tesewwur bike ko Swêreg ducara ji gundê me mezintir e.

Camêrek ji gundekî wek gundê pîrika min, ji mecbûrî hatiye Swêdê. Û piştî demekê camêrê me diçe qursa zimanê Swêdî. Wek her zimanî, di destpêkê de Swêdî jî pir rehet e. Mirov gotinên besît fêr dibe. Yanê destpêk zimanê zaroka ye. Camêrê me jî bi wê Swêdîya xwe ya zarokekî çar salî, dibêje:

— Swêdî jî ne tu ziman e lo! Zimanekî feqîr e. Li ber zimanê Kurdî ne tu ziman e. Ji xwe kultura wan jî eynî wek zimanê wan qels e. Çi kultur e çi hal e, tenê petate û masî ye.

Ê de bifikirin, milletek ko ev serê hezar salan e dewlet e, hem jî dewleteke bi rêk û pêk. Bi hezaran hunermend, zana û nivîskar û hwd ji nav vî milletî derketine û camêrê me yê ji gundekî wek gundê pîrika min hatiye, radibe dibêje »ev ne ziman e û ev ne kultur e«. Û dîsa eynî ew camêr ji keç an kurê xwe re dibêje:

— Eman gidî kurê min, keça min nebe nebe hûn li dû van gawiran biçin ha! Kultura wan cihê ye, ya me cihê ye! Filan tişt, bêvan tişt di kultura me de tuneye, ev li cem me pir eyb e....!

Û ev camêrê me ko ji gundekî wek gundê pîrika min hatiye û radibe ji zarok û yên derdora xwe re dibêje »ev di kultura me de tuneye!«. Yanê

camêrê me dixwaze bibêje »di salên şêstî de, di wexta me de ev tişt li gundê me, li gundê me jî li mala me tunebû, ji ber wê yekê ev yek di kultura me de jî tuneye«.

Û hîn gelek tiştên din. Û ev camêr ko ji gundekî wek gundê pîrika min hatiye, di nav rêxistineke kurdan de dikare bibe serok jî! Û em, an jî hinek ji me wê li dû wî biçin. Û ewê li ser me biryarê bide! Û mumkun e ko me hemûyan an ji me hinekan qir bike! Ez bi xwe nakevim nav partiya vî camêrî. Lê yên ko ji ruhê xwe aciz in bila têkevinê.

(Armanc, no:152, 1994)

Paşgotinî – an jî bi gotineke din »dedîqodî«

Di hişê me mêran de carê bi cih bûye û zû bi zû jî dernakeve: »jin her paşgotinîya dikin, dedîqodicî ne, her behsa hev dikin, li paş hev gotinîya dikin, nikarin hevûdu bikişînin, ji hev diqeherin û nizanim çi û çi û çi...«

Lê wek mêrekî hema weha em ji xwe re suhbeteke xwe wek şerîta filmekê bînin ber çavên xwe. Gelo em di wan suhbetan de qala çi dikin? Ême jî her eynî tişt in. Nivîskarên me yên mêr tên ba hev dedîqodîya nivîskarekî din dikin. Serokên me yên mêr dedîqodîya serok an giregirekî partîyeke din dikin. Axayên me yên mêr tên ba hev paşgotiniya axayekî din dikin...

Ka bisekinin ez ji we re qala serpêhatiyeke xwe bikim. Çend roj berê ez û du hevalên nivîskar em ji xwe re li qahwê rûniştibûn. Me suhbet dikir. Bê guman ez dibêjim suhbet, lê ji subetê wêdetir me paşgotinîya nivîskarekî din dikir, me tiştên nemayî digot. Demek derbas nebû ew nivîskar hat ba me. Silav da û rûnişt. Wekî ko qet tiştek nebûbe me hal û ehwalê hev pirsî. Bi wî re jî suhbeta me geş bû, welê geş bû ko îcar me bi hev re paşgotinîya nivîskarekî din kir.

Îcar çi tesaduf, nivîskarê ko me dedîqodîya wî dikir çima di ber qehwê re derbas nebû, wele hema yek ji me rabû û ban kirê. Camêr hat, wî jî silav da û rûnişt, me û wî jî me hal û ehwalê hev pirsî. Suhbeta me dîsa geş bû û suhbetê berê xwe da ser riya dedîqodîyê, me dîsa bi hev re paşgotiniya nivîskarekî din kir.

Saet bû çarê êvarê, ez mecbûr bûm rabim, çimkî min û jinikê me yê li çarşîyê hevûdu bidîta. Ez rabûm, min xatir ji wan xwest, hemûya bi rûkenî û dilxweşî xudahafizî li min kirin.

Lê ez ji we re sond bixwim, piştî ko ez rabûm wan dedîqodîya xwe li ser min domandine.

(*Armanc*, no:136, 1993)

Kêrtotirrekî

Gotin, çi yanê, hema ji ber xwe de bavêje. Yên ko avêtine çi kirine? Berdane, berdane! Berdan? Pez berdan, jin berdan û nizanim çi. Gulê di berbanga sibê de rabû ser piyan. Gundî diçûn palîyê. Palî ne ko pala çiyê ye. Ji xwe ê ko palî nekiribe nizane û ji vê seetê şûnde ez jî nikarim rabim ji wan re tarîfa palîyê bikim.

Lo de ji xwe vala ye. Ma zatî palî jî nemaye. Traktor derketiye. Neyse, tu dikarî biçî qursa zimanekî. An jî Îngilîzî. Tu nizanî bipirse. Bi pirsê meriv diçe Xursê. Pitika me digrî. De îcar ev çi bû me li serê xwe kir bela. Bi şev rabe, nîvê şevê rabe, berdestî sibê rabe, rabe û ha rabe. Ji xwe ji rabûn û rûniştinê pêştir em ji çi re dibin? Dilê min heye ez ji xwe re mangeyekê bikirim.

Bîlleheq mal û milk nedin serhev. Kanê Qarûnê dewlemend? Kanê Silêman pêxember? Ji xwe ev dunya derewîn e. Ji ber wê ye em wexta ko dikevin tengasîyê em derewan dikin. Carna jî li ciyê rehetî em dest bi derewan dikin daku em têkevin çavê civatê. Daku bila civat guhdarîya me bike!

Camêr dixwaze ko civat bala wî bikişîne lê nizane çawa bike. Bi min tirekê bike wê bala herkesî bikişîne. Heta wê demek dûr û dirêj qala wî bikin. Mumkun e bi wî navî navûdeng jî bide û bibe Kêrtoyê Tirrek, paşê jî Zarokên Kêrtoyê Tirrek, Malbata Kêrtoyê Tirrek, Gundê Kêrtoyê Tirrek, Eşîra Kêrtoyê Tirrek, Herêma Kêrtoyê Tirrek, Bajarê Kêrtoyê Tirrek, Çend Bajarên Kêrtoyê Tirrek, Welatê Kêrtoyê Tirrek, Miletê Kêrtoyê Tirrek, Zimanê Kêrtoyê Tirrek yanê Kêrtotirrekî û Kêrtotirrekîstan!

Ji me re tercumanek lazim e daku bikaribe hin gotaran ji zimanê Kêrtotirrekî wergerîne zimanê Îngilîzî! Her weha tercumanekî din jî lazim e daku ez û xwendevan bikaribin ji hevûdu fêm bikin!

(*Armanc*, no:151, 1994)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Beroş – aşxana servekirî

Li vî welatî gelek caran xelk yan ji xwe re xanîyan dikirin an jî dikanan vedikin. Û ne neheq in jî. Çimkî, dikan, xanî an jî perçeyek erd ji bo rojên pêş garantîyek e. Te dî dunya ye, çi dibe çi nabe, mirov pîr dibe dikeve ber destan, ji ber wê, ez fikirîm ko ez jî ji xwe re ji bo rojên pêş garantîyekê bi dest xim, bibim xwedî tiştek. Lê Xwedê bela banqeciyan bide, qudûmê min şikandin, qrêdî nedan min. Mala min viritî. Welê xuya ye ko musteqbeleke rût û tazî li pêş min, li benda min e. Ne xanîyek, ne perçeyek erd!

Qey hevalekî ji Armancê bihîstîye ko îstîqbala min rût e, telefonî min kir daku alîkarîya min bike, got: »Çawa be perçeyek erdê te jî tuneye, were ez perçeyekî ji rûpelên Armancê bi deyn bifroşim te!« Min jî got »baş e« û min kirrî. Pêşî min xetek li çarmedorî vî perçeyî kişand. Paşê min li ser lewhayekê navê xwe nivisand û di vî perçeyî de çikand. Nuha ez jî êdî bûm xwedî perçeyek erd -pardon- yanê kaxez.

Îcar ez fikirim, ez çi bikim çi nekim, wele baştir ew e ko li ser vî perçeyî aşxaneyeke servekirî vekim. Û hema yekser ez çûm malê, her çendî fer û folên me ne pir in jî, lê beroşek me heye. Wele piştî xire-cira bi jinikê re, min beroşa malê girt û anî danî ser kuçik û agir da binî. Min hundurê wê jî tijî zêrzewat kir. Hela em binêrin wê çi xwarin ji beroşa me derkeve.

Ha, tiştekî din jî min dikira ji bîra bikira, navê aşxanê jî weha ye:

Beroş;

Aşxana Servekirî

Teb'en beroşên xelkê her êvar dikelin, lê ya me ji ber feqîrî û tunebûnê wê mehê carekê bikele. Ger em tu tiştekî nebînin, emê nivîskarên xwe di beroşê de bikelînin û pişt re emê dest bi xwendevanan bikin.

(*Armanc*, no: 121, 1991)

Tendûr şîrket

Du Kurd wexta ko werin ba hev û li qahweyekê rûnin, pêşî behsa sîyasetê dikin, çend partîyan ava dikin. Paşê yekîtîya wan partîyên ko di wê suhbeta xwe de li ser masê ava kirine, çêdikin. Piştre, wê yekîtîyê xera dikin, bi hev dikevin.

Piştî demekê dîsa li ser wê masa ko bi hev ketibûn, li hev tên, dibin dost. Îcar, dîsa li ser wê masa ko bûbûn dost, dest bi nivîskarîyê dikin. Pêşî çend meqaleyan dinivîsin, kovar û rojnameyan derdixin. Paşê dest bi derxistina çîrok û romanan dikin. Piştre dîsa di nav wê suhbetê de, li ser wê masê weşanxaneyekê datînin. Kitêban çap dikin. Kitêb nayên firotin. Zerarê dikin. Bi ser nakevin.

Dîsa li ser wê masê dev ji weşanxaneyê jî berdidin. Li çareyek din digerin. Behsa dikanan dikin. Ji xwe re aşxaneyekê vedikin. Dîsa bi ser nakevin. Netîce; dîsa vedigerin serî û »na lo, bê siyaset nabe..!« Û qahweyeke din jî vedixwin û radibin diçin.

Îcar çend roj berê ez û hevalek, em ji xwe re li çayxanekê rûniştin. Me jî di suhbeta xwe de gelek tişt ava kirin û xera kirin. Dawîyê me li ser reklamê li hev kir; emê şîrketeke reklamê ava bikin. Bi her zimanî reklam dibe, çima bi Kurdî nebe? Û welle me şîrketa xwe danî. Me navek jî lê kir:

»Tendûr: Şîrketa Reklamên Kurdî«

Hûnê nuha bibêjin »çima ne navekî din, çima Tendûr?«. Çimkî her tiştê ko em nuh ava dikin, divê ko li ser bingeha 'urf û adetên milletê me be. Di nav milletê me de jî, cara pêşî reklama belaş li ber tendûrê hatiye kirin. Mesela, li gundan wexta ko jin diçin ber tendûrê, hem nanê xwe dipêjin, hem jî behsa gundîyên xwe dikin. Reklama kurê filankes dikin, pesnê keça filankes didin. Behsa mellê gund dikin. Derheqê zêrên bûkên nuh de diaxifin. Axirê, ez serê we neêşînim, behsa her tiştî dikin. Û ev reklamên li ber tendûrê di nav saetekê de li her derê gund belav dibin.

Ji ber wê, me ev nav li şîrketa xwe kir. Îcar bêguman, a me wê modern be. Şîrketên reklamên modern çawa kar dikin, emê jî welê kar bikin. Belê, li qahwê li ser masê me çend mîsalên reklaman jî çêkirin. Mesela:

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Vexwe Cola
Bibe pola!

Li dawet û dîlanê
Vexwe çaya Seylanê!

Tasek av û Aspirîn
Namîne êş û birîn!

Aspirînek û tasek av
Êş û jan diçin ji hinav!

Cixara me soro-moro
Em dikşînin Marlboro!

Lezzet û ta'm û xweşî
Tu jî Marlboro dikêşî?

Kî hat?
Mendo hat.
Bi çi hat?
Bi Fîat

Erd qelişî
Esman felişî
Brûskê veda
Volvo'yê deng da!

Kurê Evdalê Zeko
Xwedîyê saeta Seîko

(Armanc, no:121, 1991)

Dîsa reklam...

Welê xuya ye şîrketa me ya reklamê ne tenê li nav Kurdan her weha li nav Tirkan jî pê girt. Çimkî me du hejmar berê, di Beroşê de nimûneyek ji reklama Kurdî nivîsî. Kovara *2000-e Doğru* jî vê nivîsa me ya reklamê wergerand Tirkî û di hejmara xwe ya 1/12/1991-an de çap kir.

Lê ecêba mezin ew e ko van hevalan gotine qey bi rastî me şîrketek welê danîye. Ji xwe welê xuya ye henekên me û yên hinekan an jî yên hin milletan naçin ber hev. Çimkî wextekê dîsa me bi henekî got: Elvis Presley Kurd Derket, rojnama Hürriyetê nîv rûpel cih da vê xeberê û xwest îspat bike ko Elvis Presley ne Kurd e.

...û MINKIR-NEKIR OGULLERÎYAN

Îcar çendekî berê kurdekî li Diyarbekirê bi navê »Cenaze ‹şleri ve malzemeleri« dikanek vekirîye. Qey bihîstîye ko me şîrketa reklamê danîye, li ser vê yekê nameyek ji me re şandîye. Dixwaze ko em bi Kurdî jê re çend nimûneyên reklaman çêkin. Îcar me jî çend nimûne jê re çêkir û şand. Ji wan nimûneyan yekê jî, em li vê derê çap dikin, ji bo ko dikandar û şîrket û dezgehên me yên din bibînin û »begem« bikin da ko em ji bo wan jî reklaman çêkin:

Servîsa kefen, tabût, telqîn, yasîn û hemû karên dunya wî alî tên kirin.
Paqij, erzan, bilez!
Kevirên goristanê tên nivîsandin.
Yasîn li ser mirîyê we tê xwendin.
Bedilheca we tê kirin.
Mirîyên we tê şuştin.
Telqîna mirîyan tê xwendin.
Kefenê we tê birrîn.
Li gor her termî tabût hene.
Mirî gotîye li ba me gotîye!
Şîrketa Minkir-Nekir Ogûllerîyan
Derê Mêrdînê-Diyarbekir.

(*Armanc*, no:123, 1991)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qisê qorr - yanî gotinên hîç û pûç

Nivîskarê wê: Ne Tu! Ez!

Çend roj berê ez li qahweyekê rûniştibûm. Garsonê kafeyê hat ba min û got:

— Çi dixwazî?

Min got:

— Qahweyekê ji kerema xwe re.

Garson qahweya min anî danî ber min. Wekî her gav min pêşî cixareyek derxist û vêxist. Di pê re min şekir avêt qahwê, dawiyê min bi kevçî hêdî hêdî li hev xist. Şekir û qahwe baş li hev geryan.

Min hilmek din jî ji cixara xwe kişand. Lê ev hilma ne wek hilma her wextî bû. Hilmek welê bû ko dûman heta binê pişika min a sipî çû, li jêr zemîn-î cîgera min ket û têde fetilî. Di hemûyê fetlanokên cîgera min de gerya û ruyê xwe da ber bi jorê, hat nêzîkî qirikê, di wir re jî di bin zimanê biçûk re hat nava devê min, li ezmanê devê min ket û di nava devê min de gerya. Li qulikekê, li riyekê digerya ko çawa bike derkeve der. Xwe nêzî diranan kir, di ber diranan re xwe şemitand hat ket nabêna diran û lêvan, li wê derê jî xwe hinekî gevizand û di pê re xwe li bin çengê pidîyan xist û di nava herdu lêvan re derket der..!

Belê, a wê gavê diviya ko qultek qahwe bihata vexwarin.

Wele hema min hêdîka destê xwe yê rastê dirêjî qulpa fîncana qahwê kir. Min hêdî hêdî fîncana qahwê rakir berbi devê xwe bir. Lêv wek erdekî ko qet gîsin lêneketibe û li hêvîyê be, ji ber xwe ve ji hev vebûn. Û fîncana qahwê pêre pêre xwe nêzî lêvan dikir. Devê fîncana qahwê devê xwe danî ser lêva jêrîn, lêva jêrîn di wê gavê de wekî ko ji nû ve biafire vejîya...!

Û di nava dev de tevgerek, diran ji alîkî de, ji alîkî de jî ziman, pidî, ezmanê dev û zimanê bi-çûk, hemû bi xwe vehesyan. Di hemûyan de tevgerek, lebatek, te digo qey hemû ji do de li hêvîyê bûn.

Û gava ko fîncana qahwê hat ser lêvan, qahweya di hundurê fîncanê de êdî ber xwe nedî, wek korekî ko di çalekê werbe, hema xwe di ser lêva

jêrîn re xuşikand hundur. Lêv ji zewqa xwexuşi-kandina qahwê ji xwe ve çûbû, mest bûbû. Temamê lebatên di dêv de ji nû ve vejîyabûn.

Lê qahwe li wê derê pir nesekinî, hêdîka xwe li bin çengê zimanê biçûk xist û di wir re xwe berra qirikê da. Qirika ziwa ji do de li hêvîyê bû, lê qahwe nedisekinî, di wir re îcar xwe berra hûr da û di hûr de gerya, gerya, gerya heta ko mest bû, di quncikekî hûr de pal da...!

Û wele hema min destê xwe dirêjî xwelîdankê kir, cixara xwe girt û min hilmek din jî kişand.

(*Mîrkut*, no: 3, 1987)

Nesîhetek: mirov çawa li qahwê rûdine

Gava hun diçin qahwê, wekî herkesî ji xwe hun derî vedikin, derî vedibe, hun dikevin hundur. Derîyê ko we vekiribû û hun tê re ketibûn hundur bi xwe tê girtin, ji ber ko »yaylî« ye.

Belê we derî vekir, hun ketin hundur, pêşî hun ê çavên xwe li maseyan bigerînin, ji xwe wekî hun jî dizanin û em jî dizanin , mumkun e hinekên din jî bizanibin, zatî Xwedê ji ewwel de dizane ko li qahweyan gelek mase û kursî hene. Pêşî hunê çavên xwe li maseyan bigerînin, ger we maseyek vala dît wê wextê hun ê xwe nêzî wê maseyê bikin, lê divê maseya ko we dît bi kêmanî çar kursî li dorê hebin an na wê gavê nabe.

Belê we maseyek dît, we xwe nêzî masê kir, hêdî hêdî hun hatin ber maseyê, teb'en çenteyê we jî di destê we de ye. Pêşî hun ê çentê xwe deynin ber masê, di pê re hunê ji çar kursîyan kursîyekê hinekî bi paş de bikşînin, we kursî bi paş de kişand bi şûn de îcar hûn ê bi centîlmenî û bi awayekî kontwarî paltoyê xwe ji xwe kin, ger havîn be wê gavê jî hun ê çakêtê xwe ji xwe kin. Belê we ew jî kir, çakêt an palto muhîm nîye, em bibêjin palto. Ger we paltoyê xwe jî ji xwe kir şûn de, îcar hun ê paltoyê xwe deynin ser wê kursîya ko we paş de kişandibû. Belê karê we yê yekem diqede, îcar dor tê ser karê duwem.

Di halê duwemîn de îcar hun ê dest biavêjin -bê ma'ne- kursîya duwem, hun ê wê jî hêdî hêdî berbi xwe bikişînin û têxin rewş û halekî welê ko êdî hun karibin li ser rûnin. Belê we kursîya duwem jî kişand û xist halê ko mirov bikaribe li ser rûne, karê we yê duwem jî qedya.

Karê sêyem jî li ser kursîya sêyem e, vêca aqibeta ko we bi serê kursîya yekem û duwem de anî, hun ê wê aqibetê bi serê kursîya sêyem de jî bînin, ango hun ê wê jî bikişînin bînin deynin nêzî kursîya duwem, ya çaran ew jî her weha hun ê wê jî deynin kêleka çepê ya kursîya duwem. Belê we karê xwe yê bingehîn qedand.

Berîya rûniştinê hunê destê xwe bavêjin ji bêrîka xwe de, cixare û hestê xwe derxînin deynin ser masê, ji xwe xwelîdank ji berê de li ser masê heye, ger tunebe jî muheqqeq li ser maseyeke din heye, hun dikarin ji wê derê

bigrin. We ev kar jî qedand bi şûn de îcar hun ê hêdî hêdî û giran giran, bi stîleke kontwarî li ser kursîya duwem rûnin.

Kursîya sêyem ko li alîyê we yê rastê ye, hun ê wê bikşînin bin destê xwe yê rastê, kursîya çarem jî ko ew jî li alîyê çepê ye, hun ê wê jî bikşînin berbi xwe û destê xwe yê çepê jî deynin ser wê, herdu lingên xwe jî hunê berbi pêş dirêj bikin, ger kursîya pêncem hebe û hun lingê xwe deynin ser wê dê baştir bibe, lê tunebe jî wekî me got hun ê welê bikin.

Belê nesîheta me ya yekem ev e, ko we ev madde hemû bi cîh anîn şûn de êdî hunê li hêvîya şagirdê qahwê bin daku bila were we bavêje derve - pardon, bê hemd ji devê min derket, na na, ne welê ye- belê şagird ê were, hun ê jî qahwe an çayekê jê bixwazin û bi dilekî rehet û bi bîhneke fireh hun ê qahwe an çaya xwe vexwin..!

Heta nesîheteke din bimînin di nav kursîyan de..!

Nesîhetvanê Şîretbêj

(*Mîrkut*, no:1, 1985)

Konferansek...

Di nabêna 10-15-ê Îlonê de, li bajarê Stokholmê, ji alî Komela Deyndarên Telefonan ve konferanseke navnetewî li dar ket. Ji gelek welatên cûr bi cûr ên Ewrûpayê zaf Kurdên belengaz ên deyndarên telefonan beşdarî vê konferansê bûn. Deyndarên pîr ên ko ev serê 15 salan e deynê xwe nedane ji bo dîwanê hatin hilbijartin. Li ser navê deyndarên ko çûne îcrayê Cilo Şekalxwar axifî. Piştî wî Dîrok Telefonzan li ser tarîxa telefon û telefonçîyan axifî.

Di konferansê de axaftina herî balkêş ya Pirtêl Telefonbaz bû. Pirtêl Telefonbaz di axaftina xwe de li ser rê û rêgayên belaşvekirina telefonan sekinî û rexne li metodên klasîk girt ko berê xelkê bi ben, mûm, rûj û perên welatên din telefonbazî dikirin.

Pirtêl Telefonbaz jibo telefonkirina belaş çend mîsal jî pêşkêşî konferansê kirin. Mesela wî digot:«Saet 6'ê êvarê biçin mêvandarîyê, tam hûn li ser xwarinê ne, hema bi carekê rabin ser xwe û bibêjin, wî min ji bîra kir, gerek ez herim derve telefonî Dîyarbekir bikim, nuha li hêvîya min in. Hûn jî dizanin ko mazûvan we ji ser nan bernade û hûnê jî ji mala wan belaş telefon bikin«.

Di konferansê de li ser pirs û pirsgirêkên deyn-darên telefonan û çareserkirina wê hat axifîn.

Mewzûyên ko di vê konferansê de li ser axifîn hinek jê ev bûn:

1-Di telefonan de axaftina zêde û çareya wê.

2-Di telefonê de stranan bi zarokan didin gotin.

3-Zarokên nûzayî diqurincînin an jî dereke wan diguvêşin ko bigrî daku em jî dengê wan bibihîzin.

4-Ji welêt telefon dikin û dibêjin »reqema telefona min ev e, de ji kerema xwe re telefonî min bike.«

Û hîn gelek muşkîleyên din.

Ji beşdaran yekî dilşewitî pêşniyarek anî ko wek biryar ji hemû endaman re nameyek were şandin daku hemû telefonên xerabe yên

kolanên bajarên mezin bên tespît kirin. Li dawîyê xelatek dan endamê herî deyndar Guhgiran Pirbêj.

.....Û SÊ DIYALOG JI TELEFONÊ

»Te gune ye me pir xeber da «
– I –
— Elo!
— Elo!?
— Çawa yî?
— Baş im. Tu çawa yî?
— Ez jî baş im.
— Êêê, çi heye çi tuneye?
— Wele saxî!
— Êêê, hela bêje lo, daha daha çawa yî?
— Wele baş im.
— Êêê, tu çi dikî çi nakî?
— Wele qet, tiştekî nakim.
— Ma tuyê kengî werî? Wa ye efû jî derket!
— Belê derket, lê...
— De were lo, wele me pir bêrîya te kirîye!
— Min jî...
— Ê yanê tuyê werî yan na?
— Nizanim, hela ka em binêrin!
— Em binêrin çi ye lo, de were lo!
— Ê hela em mêzekin!
— Ê de baş e, te gune ye me pir xeber da, ezê telefo-nê bidim xuşka te, hinekî jî bi wê re xeber de, baş e?
— Baş e.
— Ê de bi xatirê te, silavan li her kesî ke.
— Ser çavan, tu jî silavan li herkesî ke.
— A va ye ez telefonê didim xuşka te.
— Baş e.

– II –
— Elo, keko tu yî?
— Erê ez im.

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Tu çawa yî, baş î?
— Wele baş im, Xwedê ji te razî be, tu çawa yî?
— Wele ez jî baş im.
— Êêê, çi heye çi tuneye?
— Wele saxî, tiştekî xerîb tuneye. Li ba we çi heye çi tuneye?
— Wele tiştek tuneye.
— Belkî we jî bihîstîye, ‘efû derketîye, ma tuyê werî?
— Wele nizanim, hela em binêrin!
— Wele me pir bîriya te kirîye, were!
— Min jî, lê hela ez mêzekim!
— Ê neyse, te gune ye, me pir xeber da, ez bidim dayê.
— Ê de baş e, bidê.
— A ez didimê, de bi xatirê te, silava li herkesî ke.
— Oxirbe, tu jî silava li herkesî ke!

— III –
— Lawo, Mahmûdo, tu yî?
— Erê dayê ez im, ez.
— Lawo ma tu çi dikî, tu li ko yî, ma tu qet li me napirsî. Ma tu nabêjî ev diya min heye, tuneye, wele te em ji bîr ve kirin!
— Na wele dayê, wîîî, ma ez qet we ji bîr ve dikim. Êêê dayê, hela bêje, tu çawayî, baş î?
— Ê de wele hema ez çi bibêjim, hema ez baş im, hema bira hun sax bin bes e.
— Êêê hela bibêje lê, tu weha rindî-rehet î?
— Wele hema ez tenê meraqa te dikim. Hema bira min tu bidîya besî min bû.
— Ê qey emê hevûdu bibînin lê!
— Ê de qey! Ma Mahmûdo waye dibêjin ‘efû derketîye, qey tuyê neyê?
— Wele niza’ dayê, hela ez mêzekim!
— Tuyê çi mêzekî lo, ma tuyê heta kengî li wan derana bî?
— Ê qey emê werin lê!
— Ê de maşalê! Hema Xwedê tevayî karê we be.
— Xwedê ji te razî be!
— Ê de Mahmûdê min bes e, te gune ye, me pir xeber da, ezê telefonê bidim birê te.
— Ê baş e, bidê.

— Ê de bi xatirê te, têm herdu çavên te, silavan li herkesî ke.
— Oxir be, ez jî têm destên te, tu jî silavan li herkesî ke.
— Ê ez vaye telefonê didim birê te.
— Ê de baş e!

– IV –
— Elo, merheba Ahmed, çawayî?
— Baş im, tu.....
(Birê min jî kêm-zêde eynî tişt tekrar kirin, wî jî telefon da birayê minê mezin, wî jî eynî tişt tekrar kirin û da bavê min wî jî eynî tişt tekrar kirin »te gune ye me pir xeber da«... Û di dorê de hîn 3 xuşk, 2 bira, 8 zarokên wan, 2 mêvan û 3 cîran hene.)

(*Armanc*, no:122, 1991)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Kurteromanek: Of, of!

Of! Ji xwe aciz im, bi xwe re ranagrim ko ji xew rabim, lê divê ko rabim, ji ber ko dibistan di heşt û pazdehan de dest pê dike, seet jî heşt kêm bîst, heta ko rabim û cilên xwe li xwe kim, bê xurînî yan bigihîjim yan negihîjim. Rabûm. Min hinek av li ruyê xwe kir, bi xawlîyê ser çavê xwe zuha kir şûn de, li ber eynikê min porê xwe şeh kir. Bi por şehkirinê re min li eynikê jî dinihêrt, hema bi derbekê min hew dît ko di eynikê de şiklek! Çi şikil bû! Çi ruyekî ecêb û tahl û tirşokî û pozekî xwaro-maro, du çavên nîvçexewî û bijangên bi kêlîşk. Demeke dûr û dirêj ji ciyê xwe nelepitîm û min yê eynikê me li hev nihêrt, em bi hev re wek hev hinekî fikirîn, em bi paşde, bi şûn de çûn, em çûn wan rojên paşerojên borî..! Min jê pirsî:

— Gelo salên te çend in? Got:

— 50

— Ê min jî!

— Di nav van 50 salan de te çi kir?

— Qet, tenê çûn û hatin, xwarin û vexwarin û tuwalet!

— E jî her wekî te...!

— Ê tu nuka çi dikî?

— Li kar digerim!

— E jî..!

Qedya

(*Mîrkut*, no:1, 1985)

Romanek gelek kurt

(1/4 rûpel)

»Ev romana kurt, min ji bo wê yekê nivîsî daku li dunyê di warê edebîyatê de bila qala me jî bikin.« (Ji Hevpeyivîna bi Hemo Temo re, ji kovara Ting û Ring).

Li jêrê em vê romana kurt a Hemo Temo seranser pêşkêşî we dikin.

(Piştî du rûpelên vikîvala yên saya û sipî, navê nivîskar û romanê careke din hatiye nivîsîn. Li dû wê rûpelê jî îcar dîsa rûpelek sipî û saya û li ser rûpela piştî wê jî navê çapxane, weşanxane, yê ko bergên wê çêkirine, tarîxa çapê, ciyê çapê, adres, copyrait û reqema ISBN hatine nivîsîn. Li dû wê dîsa rûpeleke vala û pişt re li ser rûpela din, li jêra rûpelê bi herfên xwarovîçkî hatiye nivîsîn ko »Ez vê romana xwe pêşkêşî xaltîk û metika xwe û hemû kalmêr û jinepîrên Kurdistanê dikim«. Pişt re dîsa rûpelek sipî û saya û vala û paşê roman dest pê dike. Her weha nivîskar di dawîya romana xwe de nivîsîye; »Qedya« yanê »The End«):

Dunya sar bû.

Derî lêket.

— Kî ye?

— Ez im, ez Temo!

Derî vebû.

— Wî Temoyê min tu bi xêr hatî, were hundur.

Temo ket hundur.

QEDYA

Navê min Mûhemmed e

Serê sibê zû saet şeş, balafira me li balafirgeha Şamê daket. Em ji balafirê peyabûn hatin cihê paskontrolê. Ji ber ko sibe bû, piranîya polîs û memû-rên paskontrolê ji xwe re li ser text û sedirên balafirxanê razabûn. Tenê du polîs şîyar bûn. Û kontrola paseportan dikirin. Em çar heval hatin ber kontrolê. Pêşî min pasaporta xwe da polîs, demeke dûr û dirêj li pasaporta min nihêrt, li min nihêrt, li hevalê xwe nihêrt, dîsa li pasaportê nihêrt û dîsa li min nihêrt û bi îngilîzîyeke erebkî pirsî:

— Navê te çi ye?

— Mahmûd.

— Bo çi li vêderê Muhemmed e?

— Na, Mahmûd e!

— Na, Muhemmed e!

— Na, Mahmûd e, lê bi alfaba Tirkî hatiye nivîsîn û Tirk jî wek tu dibînî »Mahmut« dinivîsin, ji ber wê ye belkî tu welê dibînî.

— Na, na, ne welê ye, li vê derê Muhemmed hatiye nivîsîn!

— Na, babo, welleh na, Mahmûd e! Ma ez bi navê xwe zanim yan tu?

Neyse, ez serê we neêşînim, »na Mahmûd e«, »na Muhemmed e«, min nihêrt ko emê nexin serê hev û serê hev biêşînin, min got »baş e babo, de bila wekî te be, bila Muhemmed be«

Îcar got:

— Na, madem Muhemmed e, te çima got Mahmud, ma qey tu bi navê xwe nizanî?

Ohoo! De îcar were ji vî belayî xelas be! Neyse, hevalekî ko berê rastî bûyerên weha hatîye, yanê xwedî tecrube, xwe di berra kir û bi Kurdî got »Mahmûd 10 dolara bidê temam e!«. Polêsê Ereb Kurdî fam nekir, lê dolar fam kir. Bi dengê dolarê re nûr ket ruyê wî û veciniqî. Û li min nihêrt wekî ko bibêje »bi ya hevalê xwe bike«. Min jî bi ya hevalê xwe kir. Bi deh dolaran ez ji navê Muhemmed xelas bûm.

(*Armanc*, no:141, 1993)

Pakêtek Marlboro

Du hefteyên me li Sûrîyê neqediya, welweleyek ket nav xelkê. Xelk û qaçaxçîyên mezin li bin guhê hev ketin. Ew û hukmat bi hev ketin. Çar ji wan û dudu ji hukmatê hatin kuştin. Li dawîya dawîyê hukmat bi ser ket û cixare ji pîyasê rabûn.

Ê min, ev nêzî bîst salan e ko ez cixarê dikşînim. Û ez tu carî jî bê cixare nemame. Îcar bi ser de li welatekî wek Sûrîyê ko rehên esebîyeta mirovî her deqqe radibin ser piyan, ger cixare jî nebe divê mirov ya xwe yan jî hinekan bikuje.

Neyse di wê tengasîyê de me hefteyekê bi titûna qaçax a ko ji serxetê dihat îdare kir. Lê paşê ew jî bi dest me neket. A îcar nebû! Me çiqasî hewl da qet nebû, heta rişwet û bertîlê jî daxî pere nekir. Wele em mecbûr man me partî kirin dewreyê. Ji hevalan yekî telefonî partîya Hemdînê Bajarî kir, yek ji mekteb-siyasî ya partîya Hemdîn hat ba me û bi dilekî şikestî got:

— Ev du hefte ye ko ji tirsa cixarê me civîna komîta merkezî li dar nexistîye, çunkî em ditirsin ko endamên me di civînê de bi hev kevin, cixare jî tuneye ko wan nerm bike, ji ber wê jî me civînên xwe avêtin piştî ko cixare derkevin piyasê.

Lê camêr navê hevalekî partîya Şemdîn el-Fellehî da. Me telefonî berpirsîyarekî wan kir, me wext û cih tesbît kir û li wî ciyê ko me soz dabû hev, me hevûdu dît. Camêrê ko li ser navê Partîya Şemdîn el-Fellahî hatibû, wî jî em birin ba endamekî hizbekî îştîrakî ya Sûrîyê, bi wasita wî me yekî Baasî dît. Wî jî got:

— Hevalekî min î "exwan" heye, belkî ew bikaribe ji me re peyde bike. Dikana wî heye, li filan derê ye, ka bisekinin ez telefonî wî bikim.

Camêrê me yê Baasî telefoneka xweş a erebî kir. Li şûna ko di nav deqeyekê de bibêje "cixare heye-tuneye?" camêr ji nîv saetê zêdetir bi hevalê xwe yê "exwan" re suhbet kir. Piştî suhbeta erebkî ya bi telefonê, li gel Baasîyê xwe me berê xwe da dikana biraderê "exwan".

Em hatin serê kuça mêrikê exwan, hevalê Baasî li serê kuçê sekinî û bi

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

desta dikaneke goştfiroş nîşanî me da û got:

— Aha ew e, lê dîqqet bikin, bila kes bi we nehese ko hûn cixarê dikirin. Ezê neyêm, çimkî hevalên min ên Baasî ewê bixeyidin ko ez herim dikana yekî exwan!

Me got "baş e" û me da rê. Em hatin ber deriyê dikanê. Dêmax qey hevalê me yê Beesî ji hevalê xwe yê exwan re şikl û şemalê me tarîf kirîye, çawa ko em çûn ber derî, exwanê me em naskirin. Ney-se piştî "selam û eleykum" û "eleykume selam" û "ehlen bîkum" û "keyfekum" û "halekum". Mêri-kê goştfiroş bi çavan îşaret da me, em bi dizî ketin hundurê dikana wî. Di dikanê de em ketin odeyeke din. Em li wê rawestîyan. Goştfiroş çû dawîya odê, ji binê laşekî ga pakêtek Marlboro derxist û da min. Min jî pênc qat zêdetir heqê wî dayê û min cixare xist bêrîka xwe û bi gelek »şukren« û »kitîr şukren«an min xatir jê xwest û em ji dikanê derketin.

Heta roja ko ez ji Sûrîyê vegeryam jî, ji bo derman jî cixare li piyasê tunebûn.

(*Armanc*, no:140, 1993)

Kerê Mellê

Li hêla Mêrdînê, li gundê 'Ewêna her kes xwedî ker e. Gundî her şev li mala yekî rûdinin û behsa başî û xurtîya kerên xwe dikin. Her şeva ko gundî li oda gund dicivin, mellê gund jî her tim li wê ye, guhdariya wan dike.

Rojekê serê sibê Melle li kerê xwe siwar dibe û berê xwe dide derveyî gund. Gundîyek li ser xênî ji Mellê dipirse:

— Bi ko de diçî Melle?

Melle mirûzê xwe tirş dike û bi ruyekî nîvxeyidokî dibêje:

— Ez êdî li vî gundî namînim, ev gund ji min re heram e!

Gundîyê ser xênî:

— Çima Melle? Kanê bêje çi bûye?

Hinek gundîyên din jî tên, hemû li hev şaş dimînin, ji hev dipirsin, lê tu kesek pê nizane ko Melle ji bo çi xeyidîye. Gundîyek jê dipirse, Melle jî dibêje:

— Ma xwedê jê razîno, ev serê çend mehan e ko ez li gundê we me û melletîya we dikim, hûn her şev rûdinin qala kerên xwe dikin, we tu rojekê qala kerê min nekirîye. Ma ev e însanetî, ev e musulmanî?

Gundî hemû li hev dicivin, paşî digihîjin biryarekê ko gundîyek li ser xênî biqîre û bide diyarkirin ko kerê Mellê li gund baştirîn ker e û gundîyek derdikeve ser xênî û diqîre û weha dibêje:

'Ewêna xweş 'Ewêna
Sê sed û sî ker lê na
Serekê di kera kerê di Mellê na!
Piştî vê anonsê kêfa Mellê tê û berê xwe dide mizgefta gund!

(*Berbang*, no:59, 1989)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Min go qey!

Kurdek mir -li ser bextê melê be-, defn kirin. Minkîr û Nekîr hatin ser û jê pirsîn:

— Bêje ey qûl, kî ye Xwedayê te?

Kurd:

— We çi ji min e, ma hûn bavê min in, xwedîyê min in? Her kes û raya xwe, hûn kî ne?

Minkîr û Nekîr ecêbmayî dimînin, cara pêşî ye ko qûlek li hember wan weha qise dike.

Minkîr û Nekîr:

— Em? Ma em qasidê Xwedê ne, qey tu bi me nizanî? Zû bersiva me bide, kî ye Xwedayê te?

Kurd li cinnehê di destê wan de dinihêre û ji xwe re dibêje: »Hema bi Xwedê serê min here Yemenê û ewraqên min jî bavêjin mahkemê dîsa jî ez ji yeka xwe danayêm«. Û ji wan re dibêje:

— We çi ji min e, hûn kî ne?

Minkîr û Nekîr dinihêrin ko nabe, ji mecbûrî vedigerin diçin ba Xwedê û meselê ji wî re dibêjin. Bîhna Xwedê teng dibe, diqehere, ditengije, kef bi ser devê wî dikeve û diqîre:

— Kî ye ew qûlê min ê zindîq, zû wî bînin cem min!

Minkîr û Nekîr tên, yaxe paçe Kurdê me digrin û dibin ba Xwedê.

Xwedê jê re dibêje:

— Ey qûlê min, ew tu yî ko tu bersiva firîşteyên min nadî ha?

Kurdê me ji xof û heybeta Xwedê hinekî ditirse, lê dîsa jî ji yeka xwe nayê xwarê û devê xwe dike guhê Xwedê, bi dizîka jê re dibêje:

— Ezê ji te re raya xwe bibêjim, lê divê tu sond bixwî û bibêjî »bi şeref ezê ji kesî re nebêjim« wê wextê ezê ji te re bibêjim kî ye Xwedayê min!

Xwedê metilmayî dimîne ko qûlek çawa dikare li ber wî weha qise bike. Lê Xwedê meraq dike ko Kurdê me ewê çi bibêje. Ji ber wê yekê Xwedê dibêje:

— Bi şeref û namûs ezê ji tu kesî re nebêjim!

Kurdê me dîsa devê xwe dike guhê Xwedê û bi dizîka jê re weha dibêje:

— Her çendî dilê min dişehite jî, lê ezê bibêjim. Heke bi rastî tu Xwedê bî, hema Xwedayê min tu yî!

Xwedê:

— Baş e, lê te çima ji ferîşteyên min re nedigot?

Kurd:

— Welle ji min tirê, min got qey ew jî ji îstixbarata hukmata Sûrîyê bûn.

(*Berbang*, no: 48, 1988)

Te çima nekuşt

Jinek ciwan di dadgehê de gilîyê mirovekî dike. Hakim jê dipirse:

— De ka bibêje gilîyê te çi ye?

Jinik:

— Hakim efendî ez vî merivî gilî dikim, lewra li ber otobosê dest avêt ji qirika min de dikira ez bifetisandama û bikuştama!

Hakim vedigere ser mirovî, jê dipirse:

— Te çima xwest ev jinika bifetisanda û bikuşta haaa, de ka bibêje sebeba wê çi bû?

Mêrik radibe pê û dest pê dike dibêje:

— Hakim efendî welleh rast e, min dikira ew bifetisanda lê xelkê dora me ew ji destê min xelas kir an na minê ew bikuşta!

Hakim şaş dibe, metilmayî dimîne û dîsa dibêje:

— Ê de ka hela bibêje ji bo çi?

Mêrik dest pê dike:

— Hakim efendî seet pêncê êvarî bû. Ez ji kar der-ketim û seet di pênc û nîvan de jî mêvanên min wê bihatana malê. Ji ber wê yekê diviya ko ez hinekî zûtir biçûyama malê. Û min lez kir ez hatim ber sekinoka otobosan, li sekinokê em ketin rêza bilêtkirrî-nê, wê wextê ev jinik jî li pêşîya min bû. Dor hat wê, çû ber cîyê bilêtfirotinê, ez jî li pişt wê me, lê ez gelekî lez dikim ko ez zû bilêtê bikirim daku bigihîjim malê, ji ber ko mêvan ê werin.

Belê hakim efendî, vê jinikê destê xwe avêt ji çentê xwe yê mezin de, devê çentê mezin vekir, çenteyek biçûk jê derxist û devê çentê mezin girt û devê çentê biçûk vekir, ji çentê biçûk pere derxist, devê çentê biçûk girt, dîsa devê çentê mezin vekir, çentê biçûk xist hundurê çentê mezin û devê çentê mezin girt û perê ko ji çentê biçûk derxistibû da bilêtfiroş. Bilêtfiroş bilêtek dayê. Vê jinikê dîsa dest pê kir devê çentê mezin vekir, çentê biçûk ji hundurê çentê mezin derxist, devê çentê mezin girt, devê çentê biçûk vekir, bilêta ko bilêtfiroş dayê xist hundurê çentê biçûk û devê çentê biçûk girt û dîsa devê çentê mezin vekir, çentê biçûk xist hun-

durê çentê mezin û devê çentê mezin jî girt. Îcar bilêtfiroş perê jibermayî dayê, vê jinikê dîsa dest pê kir devê çentê mezin vekir, çentê biçûk ji hundurê çentê mezin derxist, devê çentê mezin girt û devê çentê biçûk vekir, perê ji ber mayî xist hundurê çentê biçûk, devê çentê biçûk girt, dîsa devê çentê mezin vekir, çentê biçûk xist hundurê çentê mezin û devê çentê mezin girt...

Hakim hema radibe pê û dibêje:

— Te çima nekuşt, te çima nekuşt....?

(*Mîrkut*, no:1, 1985) (Berbang, 1983)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ji dîwana Seyda Berde

Ji şaîrên me yên kevntirîna yek jî Seyda Berde ye. Mirov dikare bibêje ko li Rojhilatê şaîrê herî kevn ew e. Tarîxa zayîna Seyda Berde kifş e; 200 sal berî zayîna Îsa. Lê tarîxa mirina wî hîn nehatîye kifşkirin. Ji ber ko Seyda Berde hîn nemirîye û nehatîye kuştin, lê çi wexta ko bimire an jî were kuştin, soz emê berî herkesî tarîxa mirin an kuştina wî binivîsin.

Seyda Berde di warê edebîyat, tarîx, coxrafya, sosyolojî, felsefe, psîkolojî, astrolojî, bîyolojî, flîlolojî, zoolojî, patalojî, mîkrobîyolojî, sîsmolojî, flîlmolojî, derewlojî û di gelek lojîyên din de gelek zana bû -pardon- zana ye, (çimkî hîn nemirîye, ji ber wê jî divê ko ji alî gramatîkê ve em dema nuha bi kar bînin).

Seyda Berde bi gelek zimanan jî dizane. Herwekî zimanê însanan, zimanê heywanan, zimanê kêzik û kurmikan û yê mêş û kelmêşan. Lê Seyda Berde berhemên xwe bi tevayî bi zimanê însanan dinivîse. Tenê çend helbestên xwe bi zimanê mêşan (ji mêşan jî mêşên hingivîn) nivîsîye.

Em li vê derê wek nimûne helbesteke wî ya ko bi zimanê mêşî nivîsîye çap dikin. Dibe ko hun jê fam nekin, lê gava ko Seyda Berde ji pirtûkên xwe, Ferhenga Mêşî û Însanî çap kir, wê wextê hun dikarin li wê ferhenga wî binêrin û ana gore ji helbestê fam bikin. Helbesta wî ya bi zimanê mêşî ev e:

Izezizim
Izezizim, izezizim,
Izez, izezîzê lizezizim,
Bizerdize, bizerdize
Bizin tize izerdize
Sizeydiza Bizerdize
(ev jî bi zimanê mêşî navê wî ye)

Belê, wekî me got, Seyda Berde di gelek waran de xebitîye û ew kesekî ji her alî de pir alî ye.

Seyda Berde pirtûkên li ser tarîx, coxrafya û ziman ne têde, heta nuha 40 dîwan nivîsîne, lê hîna nexistine çapê. Dîsa Seyda Berde nêzî 60 pirtûkên din jî dane pêş xwe, ger jîyana wî têr bike, ewê wan jî binivîse. Yanê wek plan di hişê wî de ye.

Li ser Seyda Berde mirov bi hezaran kitêban binivîse dîsa têr nake. Lê emê çend nimûneyan ji helbest û nivîsên Seyda raxin ber çavan wê gavê hunê baştir ji Seydayê me fam bikin:

Ez û yarê
Ez û yarê
Li bin darê
Bi hev şa bûn
Ta êvarê.

Tefşo
Tefşo, hevşo
Te got tefşo
Min got hevşo
Kalkê min pîrika te
Bir paş hevşo!

Ji herdu helbestên Seyda jî hin rastîyên civatê tên xuyakirin, wexta ko hun hûr û kûr û dûr bifikirin.

Helbesteke wî ya tesawuffî:

Bisîmela, bi sî mella
Bi simêlê bîst mella
E' l' hemamê,
Tu l' çola
E' j' rehmana tu j' filla,
Malek min dî
Li wî gundî
Têda keçek
Bûk bi pêçek.

Seyda Berde, gelek meqale û gotar û nivîsar jî nivîsîne. Nuha emê çend rêz ji meqaleyeke wî ya menşûr ko di kovara TING Û RING de der-

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ketibû raxin ber çavan daku hun bibînin Seydayê me çi felsefeyeke kûr û dûr bi kar anîye:

»...û tarî daket, çimkî roj çûbû ava, gava ko roj diçe ava êdî dibe êvar, ji ber ko dunya gulover e.«

Belê hun jî dibînin ko Seydayê me çi huner û sin'et bi kar anîye.

Nuha jî emê du helbestên Seyda ko bi wezna arûz hatine nivîsîn pêşkêşî we bikin. Wî ev herdu helbestên xwe jî li ser Mîrkutê nivîsîne. Lê em nizanin qesda Seyda ji Mîrkutê çi ye. Herdu helbestên wî ev in:

Mîrkut-1
Vî mîrkutî pir dil şewand
Birînên kevnare kewand
Singên di erdê de tewand
Feryad ji destê mîrkutê
Mîrkut, mîrkutê kalanî
Dar û gopal tev hilanî
Li bin banî, li ser banî
Feryad ji destê mîrkutê.

Mîrkut-2
Min qebûle das û çakût û tevr û bêr û sîrkut
Min nevêt qet tiştekî din, min nevêt tu car mîrkut.

Xwedîyê vê meqalê Muxtarê Qanqirtê bû, lê piştî ko ew mir, meqala wî ji lawê wî Hemerîkê Rûşuştî re ma.

(*Mîrkut*, no:1, 1985)

Elvis Presley kurd derket

(Tê gotin dînekî kevirek avêtîye bîrekê, çil biaqilan nikarîbûne derxistana. Gerçî ez ne dîn im lê welê xuya ye çil kesên pir biaqil bi hişkî û kûr û dûr li ser vî kevirê me xebitîne da ko ji bîrê derxin.

Di 1985-an de Eşref Okumuş ji Stokholmê ji min re nameyek şandibû di wê nameya xwe de bi nîv-henekî behsa Elvîs Presley kiribû û dîsa bi nîv-henekî dixwest kurdbûna wî bide îspatkirin. Û hetta ji bo ko bide îspatkirin bi navê »el wî serî« nîvstranek jî nivîsîbû. Îcar hinekî bi tesîra wê nîvsitranê, hinekî jî ji bo henekan min ev gotara li ser Elvis Presley nivîsî.

Îcar xwezîka Eşref ew name ji min re neşanda û min jî ji wê namê îlham negirta û ev meqaleya nenivîsanda. Çimkî paşê hinek kurdên me yên Kurdistana Başûr bi rastî bawerî pê anîn û derhalkê rabûn ev meqala me wergerandin ser tîpên erebî û li Iraqê belav kirin ko Elvis Presley kurd e. Piştre kovara Medya Güneşîyê di quncikê henekan a kovarê de ev meqale dîsa çap kir. Tu çima nabêjî nebxêrekî rojnama Hürriyetê li vê yekê varnaqile. Û wele camêrê me jî hema radibe vê meqala me ji Medya Güneşîyê digre werdigerîne tirkî û bi sernivîsa »Derewên Kurdan« di rojnama Hurrîyetê de çap dike. Û li kêleka nivîsa me jî rismê rastîn ê Elvis Presley, rismê dê û bavê wî jiyana wî ya rastîn hemûyî dinivîse. De were ji bin vî barî derkeve. Ez nikarim derkevim. Lê hema ezê tenê wê meqaleyê û tiştên ko xelkê li ser nivîsîne li vir pêşkêşî we bikim bes e.!)

Kurdbûyina Elvîs Presley:

Zimanzan, tarîxçî, fîlo-sosyolog Dr. Zikmak Çilziman di Kombûna Komcivîna Hemû Zimanzanên Dunyayê de, li Parîsê dîtineke nû pêşkêşî hemû zimanzanan kir. Û her weha ji alî me de jî rastîyek derxist ronahîyê ko heta nuha nehatibû kifş kirin.

Dr. Zikmak Çilziman gava ko ev teorîya xwe -ku êdî hatîye îspatkirin- pêşkêşî zimanzanên dunyayê kiribû, hemûyên zimanzanan mit û mat mabûn. Devê hemûyan nîv mîtro ji hev vebûbû. Hela tewr, şiklê jihevvebûna devê hinekan gelek eccayîb xuya dikir. Ji ber ko wan

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

nedixwestin vê rastîyê qebûl bikin. Bi taybetî jî zimanzanên Amerîkayî li xwe heyirîbûn, şaş mabûn. Çimkî ev dîtina nuh, ango teorîya Fîlo-Sosyolog Dr. Zikmak Çilziman, ji alî emperyalîstan ve heta nuha hatibû veşartin.

Lê, Fîlo-Sosyologê me yê jîr û qehreman xwe pê re gihand û ew ji bo me û ji bo hemûyê Rojhilata Navîn derxist ronahîyê. Belê ev darbeyeke gelek mezin e ko wê li emperyalîstên rastîxur bikeve.

Zimanzan û fîlo-sosyologên Amerîkayî ko ew jî beşdarî Kombûna Komcivîna Kongreya Hemû Zimanzanên Dunyê bûbûn, hinek ji wan ji salona kongrê derketin derve. Derhalkê, telefon, teleks, têlgiraf, FBI, CIA, MOSSAD, hemû ji xew şîyar kirin.

Çi bû ev teorîya Fîlo-Sos. Dr. Zikmak Çilziman?

Belê, Fîlo-Sos. Dr. Zikmak Çilziman di komcivînê de bi dûr û dirêjî li ser vê meselê sekinî. Emê gotinên Fîlo-Sos'ê me li vê derê bi kurtî pêşkêşî we xwendevanan bikin.

Li gor dîtina Dr.'yê me, dengbêjê bi nav û deng û menşûr Elvis PRESLEY Kurd e.!

Belê belê, hûn çewt naxwînin. Ev dîtineke rast e û ji alî Dr.'yê me jî hatîye îspatkirin.

Belê weha dibêje Dr.-yê me:

Eslê Elvis ji Kurdistana Tirkîyê ye. Ew li hêla Mêrdînê, li qeza Kercewsê hatîye dunyê. Navê bavê wî Gendo ye. Navê diya wî Etê ye. Di wexta »mecbûrî îskanan« de bavê Elvis ji Kercewsê surgûnî Şîkagoyê dikin. Ew jî mecbûr dimîne bi bavê xwe re diçe Şîkagoyê. Wexta ko diçin Şîkagoyê, wê wextê Elvis hê çardeh salî ye. Gava ko Elvis li Kercewsê bû, dergîstîyeke wî jî hebû, navê wê jî Herlibendê bû. Lê mixabin gava ko Elvis diçe Şîkagoyê, dergîstîya wî jî li Kercewsê dimîne.

Elvis li Şîkagoyê ji ber xerîbîyê û bi taybetî û xaseten ji ber agirê evîna Herlibendê, dest pê dike sitranan dibêje. Sitranên wî bi carekê de li Amerîka û Awrûpayê belav dibin. Amerîkayî, Awrûpayî û heta Asyayî hemû kes guhdarîya sitranên wî dikin, lê tu kes bi navê wî nizane. Ji ber wê yekê jî navê sitrana wî ya yekem li wî dikin.

Sitrana wî ya yekem ko li ser xerîbî û dergîstîya xwe gotibû weha ye:

Ez li vî serî
Tu l' wî serî
Wer, wer, wer

dîlbera min
Wer, wer, wer,
wer vî serî.

»Ez li vî serî« ji bo meqamê sitranê hatîye kurt kirin û bûye »Elwîserî«.

Di pê re, ji ber ko Amerîkayî herfa »e«yê dadiqurtînin û »r«yê jî di esmanê devê xwe de diloqînin û dicûn, tenê »Elwîs« maye. Yanê:

Ez li wî serî
Ezliwîserî
Elwîserî
Elwîs
Elvis

Hin kes hene ko dibêjin Elvîs îlhama xwe ji musîqîya reşikan girtîye, belam bi daxewe ne wilo ye. Wî îlhama xwe ji xerîbîyê û ji evîna xwe û ji Herlibendê girtîye.

Gava ko Elvîsê me li Kurdistanê bû, navê wî Kêrto bû, lê wekî me got, di pê sitrana »Elwîserî« navê wî guherî bû Elvîs.

Elvîs, yanê Kêrtoyê me pir ji dergîstîya xwe hez dikir. Heta van salên dawî jî wî û Herlibendê her tim ji hev re name dişandin. Lê di pê mirina Elvîsê me re, Herlibendê jî çû xwe ji serê qotê çiyayê Metînan avêt gelîyekî Kûr, întîxar kir. Lewre di pê mirina Elvîs re deyaxa wê nemabû.

Belê xwendevanên hêja, ev e dîtina Dr. Zikmak Çilziman. Lê me tenê kurtîya wê ji we re nivîsî. Di jimareya dahatû de emê bi dûr û dirêjahî li ser vê yekê bisekinin. Û her weha ji bo xatirê we emê roportajekê jî bi Dr. Zikmak Çilziman re bikin.

Elvîs an Kêrtoyê me li me pîroz be!

Muxbîrê Mîrkut-Parîs

(*Mîrkut*, no:2, 1985)

Rê û rêgayên menşûrbûyinê

Ger hûn dixwazin nav û dengê we belav bibe û hûn menşûr bibin, aha ji we re çend pend û şîret û nesîhet:

1-Bi xuşk an jî keça yekî meşhur re bizewicin.

2-Têkevin partîyekê, piştî şeş mehan îstîfa bikin û bi navê »Çima Veqetiyam« broşurekê derxin.

3-Li derekê hazirîya teza doktorayê bikin, ger hûn nikaribin jî divê ko hûn tiştekî welê bikin daku xelk ji we re bibêje »Doktor«.

4-Ji her kesî re »Filan salê ez û Mehdi Zana« an jî »Ez û Îsmail Beşikçi bi hev re di zindanê de bûn« bibêjin.

5-Her tim bi çentê James Bond bigerin.

6-Carna 10-15 rojan ji malê dernekevin der, ger ji te pirsîn »tu li ko bû?« bibêje »ez ne li vir bûm!«.

7-Di şev, kongre û semîneran de gava ko derketina we ya der pêwîst be, di ber sahnê re derkevin daku bila her kes we bibîne.

8-Di semîneran de pêwîst be an ne pêwîst be, rabin biaxifin.

9-Bi kesên menşûr û navdar re fotografan bikşînin, piştre hûn dikarin nîşanî mêvanên xwe bidin an jî di kovar an rojnameyekê de çap bikin.

10-Li welatê ko hûn lê dimînin, ji komelên mehellî bigrin hetta bi kilîse, Xaça Sor, Pen Klûb, bibin endamê hemûyan daku rojekê hûn bikaribin bibêjin »ez endamê filan rêxistina me jî«.

11-Navê kesên meşhûr tim nîvco bibêjin, wekî ko hûn wan pirr baş nas dikin. Mesela li şûna ko hûn bibêjin Hikmet Çetin, Nurettin Yilmaz û hwd, bibêjin »wê rojê min bi Huko re xeber da«, an jî »Nûro, Salo« û hwd.

12-Demekê bibêjin »min dev ji cixarê berdaye« daku xelk bibêje » Filankes dev ji cixarê berdaye« û bi vî awayî wê behsa we bikin. Lê paşê dîsa dest pê bikin an jî bi dizî bikişînin.

13-Çi nivîs an kitêbek Kurdî derkeve bibêjin »ez nivîskarê wê nas dikim, beriya ko derxista ji min re şand, min kontrol kir«.

14-Rast rûnin, pirr mekenin, her tim ciddî bin, qala tiştên ciddî bikin,

quncikê Beroşê mexwînin.

Pişti van nesîhetan ger nav û dengê we belav nebe wê wextê herin ber dîwarê mizgeftê an jî bi rojinê (kulek) de birîn, wê herkes qala we bike.

(*Armanc*, no:128, 1992)

Mêranî

Canê min sixilmîş dibe, him jî pir dibe, welê canê min sixilmîş dibe ko hema hema dikim biteqim. Kesek bi telefonê be jî, ger halê min bipirse xuya ye ezê bigirîm. Her çendî li welatekî wek welatê me, girîn li mêranîyê nayê, lê dêmax carna meriv di rewşa xwe ya psîkolojîk de dikare ji hin qistasên mêranîyê bikeve. Bêguman qistas jî ew qistas in ko civatê li mêranîya me birrîne. Yanê civat li ser me biryarê dide da ko kî ji me mêr in, kî nemêr in! Û ji xwe mêranî jî îzafî ye. Li gor cî û war û civat û heta malbatan diguhere. Li gor yekî Awrûpî û li gor yekî Afrîqî û li gor Kurdekî têgehiştina mêranîyê cihê ye. Endamekî milletekî xwenas dikare ji bo milletê xwe biçe ser mirinê û endamekî eşîre-ke kurda jî dikare ji bo mirîşkekê deh kesan ji eşîreke din bikuje û herdu jî li gor civata xwe mêr in.

Mesela, di civata kurdan de ger yek bikaribe li yekî din xe, ger yek bikaribe neheqîyê li hinekên din bike, an jî wekî ko hinekên me jî di jiyana xwe de kirine, ger yek bikaribe li bavê xwe bixe û hetta bi keviran bera bavê xwe de û wî ji gund derxe, ew jî mêr e! Yan jî »Law wele lawikî mêr bû, li ber devê mahkemê diya xwe ya qahpik kuşt!« ev jî yek ji qistasên mêranîyê ye. Bê guman civata ko biryara mêranîya me mêran didin, nafikirin ko jinik ji bo çi bûye qahpik. Dîsa nafikirin ko camêr çima li bavê xwe xistîye! Lê li gor qistasên xwe herdûyan jî mêr îlan dikin.

Hema aha ji we re mêranîya herî eşkere û berbiçav ji Kurdistana Iraqê, pêşmergeyên PDK û YNK'ê bi »mêranîyeke« welê direpînin hev ko hema hema hindik maye qira hev bînin. Û terefdar û serokatiya herdu alîyan jî radibin û rûdinin qal û behsa mêranîya endam û partîya xwe dikin. Lê herdu serî jî tiştekî ji bîra dikin ko qira hev bînin wê demê wê mêr li ortê nemînin û nizanin ko bê mêr jî mêranî nabe.!

Carna ez li rewşa partîyên me dinihêrim hin gotinên pêşîyên me tên bîra min, de êdî têderxistin û jêfamkirin û şirovekirin aîdî we:

— Axa rabûn hingirma, feqîr û xizan çûn li ber niga.

— Du seriyê berana di beroşekê de nakelin.
— Ji xelkê re masîgir e, ji xwe re kûsîgir e.
— Kurmê darê ne ji darê be dar narize.
— Malxuyê malê lolo be, xwarina me yê çilo be.
— Suyarê hespa xelkê tim peya ye.
— Xeta xwar ji gayê pîr de ye.
— Aqilê sivik barê giran.

(*Armanc*, no:160, 1995)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Hero Hemê were vira

(Monsieur Hemê viens-ici!)

Peyvek heye ko Fransiz jê re dibêjin »Monsieur« (Mösyö), Îngiliz dibêjin »Mister«, Swêdî dibêjin »Herr« û Tirk jî dibêjin »Bay«. Gelo we zanibû ko Kurd jî dibêjin »Hero«. Hero di axaftina rojane de, her gav ji alî xelkê ve tê bikaranîn. Xelkê me wê di maneya Mösyö, Bay an jî Mister de bikartîne. Lê qey ronakbîrên me lê varneqilîne, an jî lê varqi-lîne, lê ji ber çi sedemî ye em nizanin ji bo çi di ni-vîsên xwe yên ceribandî û deribandî de bikar naynin.

Belê Hero gotineke xwerû Kurdî ye, wek nan û avê. Her çendî hin kes hene di vê maneyê de Beg, Mîr, Axa, Kak, Mîrze, Berêz bi kartînin, lê bi min ew çewtiyek gelek mezin dikin.

Carê Beg bi Tirkî ye, ger em xwerûtîya zimanê xwe dixwazin, divê em peyvên biyanî ji nav zimanê xwe biqewitînin û bavêjin.

Mîr û Mîrze jî gotinên welê ne ko di dewra zilm û zordestîyê de dihatin bikaranîn. Yanî peyv in ko ji nav taristana feodalîzmê tên, loma divê em qet wan bi kar neynin, yan na emê feodalan ji nû ve vejînin.

Berêz ji xwe gelek eyb e, çimkî Berêz halê tewandî yê Beraz e. Beraz jî ji xwe hûn dizanin çi ye.

Her çî peyva Kak, ji xwe divê qet neyê bikaranîn, çimkî pirr xerab e. Carekê li gundê me yekî ji yekî re got kak, li ser vê gotinê du ‘eşîr bi hev ketin, nozdeh kes hatin kuştin, bîst û heft kes jî birîndar bûn. Şerê wan hîn jî berdewam e, çimkî:

Kak yanê kaka
Kaka yanê qaqa
Qaqa yanê » ‘e ‘e »
û ji wê jî xerabtir tiştek nîne.

Lê wekî me li jorê jî got, peyva Hero pir bi hêsanî û xweşî di şûna Mösyö, Mister, Bay û Herr de tê bikaranîn. Ezê nuha jî ji we re çend nimûneyan

li gel wergera wan a Fransî binivîsim daku hûn baştir fam bikin:

1-Hero tu çi dikî?
Monsieur, qu'est-ce que tu fais?

2-Hero tu kuda diçî?
Monsieur, où vas-tu?

3-Hero Hemê were vira!
Monsieur Hemê viens-ici!

4-Hero te nan xwar?
Monsieur tu as mangé?

Ger binivîsim nimûne gelek in. Lê bi min we êdî fam kir û ez welê bawer im ko ronakbîrên me jî êdî wê vê peyvika me ya xweşik di nivîsên xwe de bi kar bînin.

Ha min ji bîr ve kir ko bibêjim; her weha peyveke ma ya din jî heye, ew jî di maneya Madam, Bayan de tê bi kar anîn ko ew jî Herê ye, divê ko hûn wê jî bizanibin.

(*Armanc*, no:127, 1992)

Zikê min diêşe

Zikê min diêşe! Min savar jî nexwariye! Qey ji meraqa ye. Gerçî ez çûm duxtor, got: gastrît e, yanê destpêka ulserê. Ulser ne kula salê ye, lê jê xerabtir e. Dermanê wê jî cixare, araq û îsota tûj e!

Ez cixarê dikişînim, îsota tûj piştî zewacê min dest pê kir, lê araq, na! Ez nikanim vexwim. Bîna wê ne xweş e! Ji xwe bi qedehekê ez serxweş dibim. Serxweşî xweş e. Meriv hê rehet qise dike. Tiştê ko di neserxweşîyê de mirov nikane bibêje, di serxweşîyê de mirov pir bi hêsanî dibêje. Ma ne ji ber wê ye ko her tim li masa serxweşan şer derdikeve, pevdiçinin, bi hev dikevin, an jî hevûdu dikujin.

Kuştin ne baş e. Bi kuştinê meriv nagihîje tu derekê. Cengîz Xan û vê dawîyê jî Hîtler gelek kes kuştin. Lê çi? 'Emrê wan têr nekir. Bi mirada xwe şa nebûn!

Zikê min diêşe, dilê min diçe cixarekê û îsota min tê!

Na welleh! Ya rastî xewa min tê. Û zikê min diêşe. Û çavên min diçin ser hev. Ger ez di xew re biçim berçavka min ê bişkê. Bê berçavk jî ez nikarim rakevim. Çimkî wê wextê jî di xewnê de ez nikarim net bibînim! Ji xwe nuha çar berçavkên min ên şikestî, yeka nîvşikestî heye û ya saxlem a li ber çavê min jî ne têde.

Zikêşî ne bes bû îcar çavxerabûn bi ser de hat! Ji xwe ezê qala êşa diranan nekim!

Ero qet di eynî wextî de hem zikê we û hem çavê we û hem jî diranê we êşiyaye? Na! Axx, axx! Hela bila biêşe wê wextê hûnê ji halê min fam bikin ko ez di bin kîjan şertan de û bi çi zor û zehmetî û bi taybetî jî di bin kîjan îşkenceyan de van çend rêzên xwe yên nexweşik ji bo we dinivîsim!!!

(*Armanc*, no: 158, 1995)

Pişika min a sipî ya alîyê çepê diêşe

Ez nexweş im, gelekî nexweş im. Pir diêşim. Pişika min a sipî ya alîyê çepê ji ber cixarê reş bûye. Bîhna min dernakeve. Dikuxum. Xire-xir ji qirika min tê. Diranên min zer bûne; ji ber cixare, qahwe û çayê. Belkî jî ji ber nefirçekirinê. Lê dîsa jî pişika min a sipî ya alîyê çepê diêşe. Û ez cixarê dikişînim daku bîhna min vebe. Lê malmîrata cixarê jî qet bîhna meriva venake, tew bi ser de bihnê li mirovî diçikîne. Lê heşê meriva vedike. Ji xwe yê girîng jî heş e. Ma heş tunebe tu yê ji ko bizanibî ko tu sax î an nexweş î!?

Lê dîsa jî ez diêşim. Pişika min a sipî ya alîyê çepê diêşe. Ez naçim duxtor. Hûnê bibêjin »çima?«. Naçim! Lê ko duxtor bibêje »kansêr e«. Kansêr pîs e. Mirov pê dimire. Ez naxwazim bimirim. Ji xwe Kurd namirin. Kî ne em!?

Ez dibêm qey dilê min jî diêşe. Lê ez ji jinikê re nabêjim. Êşa dila giran e. Bi çi awayî dibe bila bibe hema giran e! Carna tîr li alîyê min ê çep radibe. Û ez dikevim gumanan, »gelo krîza dil e?« Lê na! Ez naçim duxtor. Lê ko duxtor bibêje »krîza dil e!« A wê wextê çû ji kîsî min. Krîzek, dudo, sisê, yellah dunya wî alî. Êdî heta ji te were nizanim kudera xwe li avê xe. Yê ko di xesarê de ye tu yî!

Piranîya caran ez heta çarê sibê ranakevim. Neku ji dil heta çarê sibê dixebitim, lê ji tirsa rûdinim û bivê nevê dixebitim jî. Çimkî dewra herî qelslêdana dil seet çarê berdestî sibê ye û piranîya kesan di wê saetê de ji vê dunyê bar dikin.

Ez dîsa kuxyam, sînga min êşya. Nigên min jî ditevizin. Qey ji ber pirrûniştinê ye!? Ma yan na ji bo çi wê nigê min bitevizin. Ma ez bi nigê xwe zanim. Çil sal e em cîran in. Lê çima ez kuxyam!? Û çima sînga min êşya? Û çima pişika min a sipî ya alîyê çepê ji ber cixarê reş bûye? Û çima diêşe? Lê ez naçim duxtor. Ezê fîlimê pişika xwe ya sipî nekişînim. Lê ko nexweşîyek derkeve!? Na ez naçim! Ez xwe rezîl û riswa nakim. Ji ber nexweşîyeke biçûk ez ruyê Kurdan li ber van duxtorên bavfille rûreş nakim. Daku bila nebêjin Kurd jî nexweş in!

Ez dîsa kuxyam. Û pişika min a sipî ya alîyê çepê diêşe!!!

(*Armanc*, no: 164, 1996)

Contens, contenu, inhalt, innehåll, îçîndekîler, fêhrist û yên me...!

Zimanê me zimanekî zor zor, pir û gelek û zaf dewlemend e. Bi rastî hela tewr xwedê kêmanîya wan bide -pardon nede- hin zimanzanên me hene ko bi kar û bar û şuxul û îş û xebatên xwe yên ilmî-zanistî zimanê me hîn dewlemendtir dikin, berbi pêş dibin.

Hela tewr gava ko bi Tirkî, Farisî, Erebî an jî bi zimanekî din difikirin û bi Kurdî dinivîsin, bi rastî wê gavê ew zimên gelek dewlemend dikin, bêje û peyv û peyvik û kelîme û wuşeyên nuh, tabîrên nuh dixin nava zimanê me û zimanê me jî welê dewlemend dibe ko êdî milletê me -yên xwende- pêre nagihîjin ko xwe fêrî bêje û peyv û peyvik û wuşe û kelîme û gotinên nuh bikin. Ji ber ko zimanê me roj bi roj -hetta hin kes dibêjin saet bi saet- bi saya van zimanzanên me pêş de diçe, hetta welê pêşde diçe ko mirov gava ko ferqên di nabêna Kurdîya mehek berê û ya mehek şûn de (wekî Kurdîya meha temmûz û tebaxê) dide ber hev, bi serê xwe tenê ji wan peyvik û gotinên nuh ferhengek pêk tê.

Ji ber vê yekê jî divê mirov ji bo kesên xwende qurseke zimanê Kurdî veke daku hîn baştir xwe fêrî zimanê xwe bikin. Her weha divê ko mirov mehê carekê jî ferhengekê derxe.

Nuha emê li vê derê mîsalekê (hûn dikarin wekok, mînak û nimûne jî bi kar bînin) raxin ber çavên we ko wê gavê hûnê bi xwe jî bibînin û fam bikin û her weha jî bigihên ko bi saya van zimanzanên me, zimanê me çiqas pêş ve çûye.

Belê wekî me got emê tenê li ser bareyekê (mewzûyekê) mînakekê bidin.

Kelîmeyek (hûn dikarin wişe, ûşe, peyv, peyvik, gotin, qise, bêje, xeber, qezî jî bi kar bînin) heye ko îngilîz jê re dibêjin CONTENS, Fransiz dibêjin CONTENU, Alman dibêjin INHALT, Swêdî dibêjin INNEHÅL, Tirk dibêjin ÎÇÎNDEKÎLER û Kurd jî dibêjin:

1-Têdayî

2-Têxistinî

3-Serecem
4-Naverok
5-Nawerok
6-Nêwerok
7-Têkirinî
8-Hundurî
9-Têda
10-Têde
11-Fêhrist
12-Navî
13-Yêtêda
14-Zikîda
15-Dizikda
16-Zikî (yê di zik de)
17-Di hundur da
18-Di vê jimarê de
19-Di vî hejmarî de
20-Lem jimare da
21-Fêhristî basekan
22-Fêhristî em jimare

(*Mîrkut*, no:1, 1985)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Tahlîla kelîmeyên kurdî

Bi amadekarîya

Pîrêfissor Dr. Barîûs Jiberxwevaavêtîûs

(Ev rûpel aîdî zimanzan Pîrêfissor Fîlolog Dr. Barîûs Jiberxwevaavêtîûs e. Berpirsîyarê tehlîl û dîtinên li ser kelîmeyan ew bi xwe ye. Divê bête zanîn)

Kelîmeyên Kurdî ne ko ji ber xwe ve çê bûne, hemû kelîme (peyv) bûyereke wan, serpêhatîyeke wan heye. Yanê, gava ko em dibêjin derpê an jî deling, ew ne ko ji ber xwe ve hatine çêkirin, kelîme li gor pêvajoya dîrokî û jiyana civakî drûvek stendîye û hatîye gehiştîye vê rojê. Belê, em dîsa werin ser wan herdu mîsalan; derpê û deling. Derpê ji du kelîmeyan pêk hatîye: der û pê

Der ji dihere, diçe'yê hatîye, Pê jî ling e û herdu bûne yek bi hev ve helîyane bûne derpê, ango ê ko diçe pê, yanê: dihere pê... diherpê... derpê

Gerçî hin kes hene ko dibêjin derpê ji drapeau(al, bayrax) ya Fransî hatiye, lê bi min na. Ma qet dibe ko ala milletekî bibe derpiyê milletekî din.

Deling jî her weha ye, ew jî ji dihere lingê hatîye. Yanê ji du kelîmeyan pêk hatîye; yek fîîla dihere/diçe, ya din jî ling/nig.

Herdu bi hev ve zeliqîne heliyane bûne yek kelîme yanê deling. Her çendî hin kes hene ko dibêjin ev kelîme ji Dev+ling'ê hatîye, lê belam bi min ev dîtinek çewt û xelet û ji zanîna lenguistikiyê 5 km dûr e.

Belê, bi min we êdî fam kir ko ezê tahlîla kelîmeyan bi çi awayî bikim. Ango gotina min; ezê ji vê û bi şûn de di vê rûpelê de ji we re her carê tehlîla kelîmeyekê bikim.

Kelîmeya me ye vê hejmarê HEVRÎŞIM e, her wekî hûn jî dizanin hevrîşim di nava Kurdan de di maneya helîl, herîr, îpek de tê bikaranîn.

Hevrîşim ji pênc kelîmeyan pêk hatîye:

1-hev

2-û

3-du

4-vereşandin
5-mêş

Belê belê hevrîşim ji van kelîmeyan pêk hatîye. Ango ji HEV Û DU VEREŞANDINA MÊŞÊ hatîye. De ka werin vêca em li pêvajoya wê ya dîrokî binêrin, daku çawa ew pênc deng bi hev ve helyane bûne yek deng. Cumleya me weha ye:

H E V Û D U V E R E Ş A N D I N A M Ê Ş Ê

H E V R Î Ş I M

Û ev herfên jorîn bi hev ve zeliqîne bi hev ve helyane bûne yek kelîme, yanê: HEVRÎŞIM

(*Mîrkut*, no:1, 1985)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Çend peyvikên nû

Ji zimanzanên me yê bi nav û deng Fîlolog Dr. Zimandirêj Devjiheve çend roj berê di konferansa hemû zimanzan û zimannasên Kurdan de çend peyvikên nû pêşkêşî beşdarên konferansê kir. Em jî li vê derê wan peyvikên nû yên ko Dr. Zimandirêj Devjiheve pêşkêşî konferansê kiribû, dinivîsin ko xwendevan jê fam bikin daku ew di çi maneyê de hatine bi kar anîn. Te dî dunya ye, dibe ko rojekê hun di kovar, rojname an jî di kitêbekê de rastî van peyvikan werin. Belê ev in peyvikên çêkirî an jî bi gotineke din naylon:

Xuliqandîyolojî: Bîyolojî
Harûdînolojî: Psîkolojî
Firejinabêbask: Hostes
Firemêrêbêbaskajoyêbalafirê: Pîlot
Şematolojî: Sansasyon
Malamuxtar: Enstîtu
Erdkolojî: Arkeolojî(1)
Erdkolog: Arkeolog
Muxtar: Serok, presîdent
Melle: Wezîrê Diyanetê
Kaşkaşokaserhesin: Trên
Nihêrtokaleyistok: Televîzyon
Rûnkişandin: Xweşkirin, yaxcîlix kirin
Lingêşikestî: Tolazî, qebedayîtî
Homokutîzm: Homoseksualîzm
Homokut: Homoseksuel
Rexnegirtin: Tenqîdkirineke normal
Rêxgirtin: Tenqîdkirineke anormal

---

(1) Di maneya Arkeolog û Arkeolojî de hin kes hene peyvên Zengarolog û Zengarolojî bi kar tînin, di eslê xwe de ev xelet e, çimkî Zengarolojî di nav Erdkolojî, yanê Arkeolojîyê de beşek e. (Mîrkut, no:1, 1985)

Çîroka Adem û Hewê
û zarokên wan Harbîl û Karbîl

Tarîxa Kurdan û ya însanîyetê bi hev re dest pê kirine. Loma jî gava ko çîrokzanên me yên tarîxzan dinivîsin divê ko ji destpêka însanîyetê dest pê bikin; yanê ji me Kurdan! Çimkî destpêka însaniyetê em in.

Bav û kalên mirovan -ku ji teref hemû dunyê ve tê qebûlkirin- Adem û Hewê ne û ew bi xwe destpêka însanîyetê ne û Kurd in. Wê wextê bi hêsanî mirov dikare bibêje ko însanîyetê bi me Kurdan dest pê kirîye.

Vêca hûnê bibêjin çima? De ka bisekinin ez ji we re bibêjim.

Carê, navê Adem û Hewê bi xwe bi Kurdî ne. Çimkî Adem wekî hemû alim dizanin ji herîyê yanê ji çamûrê hatiye afirandin. Îcar bi Kurdîya pir-pir-pir û gelek kevn ji çamûr û herîyê re digotin »avzêm« an jî »avzem«. Û ev gotina »avzêm«ê nuha jî li hin deverên Kurdistanê yên şikeftwarî jî tê bi kar anîn.

Belê em dîsa werin ser gotina Adem. Îcar bi dûr û dirêjî ez nikarim ji we re tehlîla wê bikim, lê li gor dema ko em tê de ne -divê ko mirov gelek bi lez, zû û di demek kurt de kar bike- ezê ji we re pir kurt di hundurê demê de ji alî etîmolojîk û guherînolojîk qalib û kiras guhertina vê gotinê binivîsim. Belê, guhê xwe giran mekin û çavê xwe megrin, binêrin:

Avzêm ——- Avzem —— Avdem —— Adem

Wekî hûn jî dibînin, formulasyona me ya guherînolojîka etîmolojîka peyvê li ber çava ye. »Z«ya di »Avzêm«ê de berê wek »zal«a Erebî bû, lê di nav sürec û merhele û pêvajoya zimanê me yê sor î dirêj de ev »Z« guherî bû »D« (wek guherîna di zama û damat, zerya û derya de). Îcar pişti demekê ji ber tembelî û teralîyê me »V« jî daqurtand û tenê »Adem« ma.

Ji bo Hewê jî hin tehlîl û lêkolînên etîmolog û guhertologên Kurdan hene ko dibêjin gotina »Hewa«yê jî ji »Herweha«ya Kurdî hatiye. Lê bi a min ez dibêjim hema kurt û kurmancî, jin gava ko dizewicin bi ser milletê eşîra mêrê xwe ve tên hesibandin. Îcar gava ko Adem (ku êdî îspat bûye) Kurd be, bivê nevê jina wî jî wê li ser Kurdan were hesibandin.

Pişt re Xwedê du kur dan Adem û Hewê. Ji xwe ji navê Zarokên wan jî

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mirov tê derdixe ko malbata wan malbateke xwerû Kurd bûn.

Kabîl ji ber ko pir bi kar bilî dibû bavê wî jê re digot »Karbil« yanê yê ko bi kar bilî dibe.

Habîl jî gelek nerehet û har bû, bavê wî jê re digot »Harbil«, yanê yê ko bi harîtîyê bilî dibe. Ji xwe Habîl (yan jî Harbil) pişt re ji ber vê harîtîya xwe neheqî li birê xwe dike, ji bo perçeyek erd radibe wî dikuje.

Bêguman ji vê yekê jî xuya dibe ko her çendî însanîyetê ji me Kurdan dest pê kirîye, lê her weha hevûdu kuştinê jî bi me Kurdan dest pê kirîye.

De neyse, destpêka însaniyetê û ya hevûdu-kuştinê li me pîroz be!

(Armanc, no: 158, 1995)

Kaşkaşokapaşpaşokaserhesin

Yekî nameyek şandîye, rexne li Armancê girtîye. Goya di Armancê de gelek gotinên Erebî hene û çima em Kurdîya wan nanivîsin.

Heta ji me tê em dixwazin zimanê rojane yê xelkê bi kar bînin. Yan na, neku em Kurdîya wan gotinên Erebî nizanin an nikarin çêkin.

Lê, ger em wekî wan hevalan bikin, bi ya me ewê Kurdîyek naylon derkeve meydanê. A ji we re mîsalek:

Katjimêr 16.00 ez ji kaşkaşokapaşpaşokaserhesin peya bûm. Ez pir birçî bûm, çûm zûxwaringehekê, min kebabzivirandokek bi nan kirrî û xwar.

Paşê li kaşkaşokapaşpaşokaserhesinîyabinerd siwar bûm çûm malê. Ji xwe katjimêr bûbû 18.00. Dema nûçeyan bû. Min dûrfermandaroka wêneguhezê girt û pêlî coya yekem kir.

kaşkaşokapaşpaşokaserhesin: trên
kaşkaşokapaşpaşokaserhesinabinerd:metro, tunnelbana
zûxwaringeh: snackbar, kiosk
katjimêr: saet
dûrfermandarok: qûmanda tv yê
wêneguhez: tv
coya yekem: kanal 1.
(*Armanc*, no:122, 1991)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Compûtera ber dilê min xeyo lo lo!

Wê rojê min di MED TV´ê de guhdariya sitrana »Xezalê hêlî can« kir. Camêrê ko digot li gor dewr û çax û wexta me ya îroyîn hin gotin lê zêde kiribû, an jî guhertibû. Mesela, di derekê de digot:

»…..

(Mi) bazara şahra te kir xezalê hêlî can

Mi j' bîr kir ûtî nekir delalê hêlî can«.

Îcar ez fikirîm gelo wexta ko ev strana hat çêkirin ma wê demê nizanim ûtî hebû yan na? Lê, na! Xuya ye camêrê ko gotiye wî jî xwe adapteyî dema me kirîye.

Vêca piştî ko min guhdariya vî camêrî kir strana »Hey lo lo delal« hat bîra min. Gelo pêşde bi vî awayî were gotin wê bi me ecêb were!

Hey lo lo delal, heylo lo delal
Bi telefona desta dibêm delal
Bi faksê dibêm delal
Bi modemê dibêm delal
Bi internetê dibêm delal
Computera ber dilê min xeyo lo lo!

Delêlo heyran
Berrîka Mêrdînê berrîkî dûz e
Pozê volvo û mercedesan bi ser da xûze
Nava sîng û berê min evdala Xwedê
Bi dolar û mark û kronan nûze nûz e xeyo lo lo!

Delêlo heyran
Ez ê delalîkê malê bi rêkim
Wezê taştêyekê ji delalê malê ra çêkim
Wezê temam kîvî, ananas û avokadoyan jê re lêkim
Eger qîma delalê malê pê neyê
Wezê cotê sîlîkonan jê re pêşkêş kim xeyo lo lo!
(*Armanc*, no: 165, 1996)

Nîv-nameyek ji Mecîdê Haco

Rojekê yek li pîkaba xwe siwar bû diçû bajêr, bi rê de gundîyek çêlek(mange)a xwe destkêşî xwe kiribû, destê xwe jê re hilda da pê re here bajêr. Şofêr lê sekinî û herduwa arî hev kirin, çêlek kirin paşîya pîkapê û xwedîyê çêlekê di rex şofêr de siwar bû. Piştî hinekî çûn rastî yekî rêbwarî hatin, wî jî destê xwe hilda, şofêr sekinî ew jî li paş di rex çêlekê de siwar kir. Hinekî din bi rê de çûn yekî dî jî destê xwe ji pîkapê re hilda, şofêr ew jî li paş siwar kir.

Di paşîya pîkabê de herdu rêbiwarî bi hev re dipeyivîn, ê pêşî ji yê dî dipirse dibêje:

— Gelo xêr e tu diçî bajêr?

Dibêje:

— Wele ez diçim ji xwe re çêlekekê bikirim.

Ê pêşî dibêje:

— Wele ez jî diçim bajêr vê çêleka xwe bifroşim, hema bi kêrî te bê, em li ser wê li hev bên ez bidime te.

Bi çiqasî, ne bi çiqasî gelek hindik li hev hatin û yê dikire heqê çêlekê dide mêrik, ew jî jê re pîroz dike. Piştî kêlîkê yê bêrîka xwe tijî pere kirîye destê xwe li banê pîkapê dixe dibê ezê peya bim. Pîkap sekinî, mêrik peyabû, heqê şofêr da û pîkap çû.

Gava gîhan bajêr, arî hev kirin û çêlek anîne xwar, piştî heqê şofêr danê, ê ko çêlek kirîye rahişte hevsarê wê û li pey xwe kişand. Xwedîyê wê berî pê ve got:

— Weh weh tu çi dikî kuro?

Got:

— Ez çi dikim? Ez çêleka xwe dibim, çi bi te ketiye?

Yek ji wî û yek ji wî, hev dane ber dehfa, giha xebera, giha kulma, heta cendirme hatin herdu dane berxwe birine qereqolê.

Ev çîrok heye rast bûbe, heye jî xeyal be. Ez bi xwe jî nizanim dawîya wê çilo bû, çawa ji hev safî bûn. Ev yek bira bi hêvîya xwendevanan ve bê. An jî yekî weke biraderê Mahmûd Lewendî belkî karibe dawîyeke fantazî

an jî tinazî jê re peyde bike. Lê tiştê rast û bi cih bi qasî heqê du çêleka giha cendirman.

Mecîdê Haco
Qamişlo

Kek Mecîdê Haco, ma nayê bîra te piştî ko ew herdu camêr bi hev ketin, li qereqolê cendirmeyan jî têra xwe li wan xistin. Paşê herduyan xeber şandin eşîrên xwe, serok û axayên eşîrên wan hatin, bi bac û rişwet û bertîlan ew bi zorê ji destê cendirman xelas kirin. Mange jî wek diyarî ji qereqolê re bexşandin. Xwedîyên qereqolê mange serjêkirin ji xwe re kirin qelî û xwarin.

Eşîrên van herdû camêrên me jî li ser vê meselê bi hev ketin. Ji alîkî 15 û ji alîyê din 17 kes hatin kuştin. Zevîyên hev şewitandin, talanê hev birin. Nêzî 20 salan şerê wan berdewam kir. Û ev şer netenê di nav wan herdû eşîran de ma, wek nexweşîya AIDS'ê xwe li hemû eşîrên Kurdan gerand.

Lê wekî tu jî dizanî, li vê dunyayê meriv nikare rê li ber pêşveçûna civatê bigre, em Kurd jî li vê dunyayê dijîn, ji ber wê yekê civata me ya feodal bi peydabûna kapîtalîzmê re hêdî hêdî ji hev felişî û piştî demekê bi derketina traktor, makîna cilşuştinê, ûtî, televîzyon, marlboro, vîskî û makîna porzuhakirinê re, eşîr ji hev ketin. Erê eşîr ji hev ketin, lê îcar jî li şûna wan hin cûreyên nû yên eşîran; partî û hizb û rêxistin derketin.

Û tu dizanî ji gelek nexweşîyan re çare hatine dîtin, hetta tê gotin ko ji AIDS'ê re jî çare dîtine, lê ji malmîrata mîkroba nexweşîya dijminîyê re hê çare nehatiye dîtin, ji ber wê yekê ew dijminî ya ko ji ruyê wê mangeya nebixêr a ko cendirman xwar, derketibû, di nav partiyên me de ji nû ve zîl da. Û îro li herçar perçeyên welêt gava ko kela partiyên me radibe, te hew dît bi top û tivingan repandin hev, êdî hed û hesabê kuştîyan ne diyar e.

M. Lewendî (*Armanc*, no:149, 1994)

Serboriyek

Ez wan rojana ji xwe re li çarşîyê digeryam. Ê de ez dibêjim çarşî, hun kuçe an tenê papûrekê fam nekin. Çarşîyek ko her der wê kuçe û cadde, kuçeyên fetlok fetlokî. Ez daketim kuçeyekê, nêta min hebû min ji xwe re tiştek bikirîya.

Ez çergî (çawaku) daketim kuçeyê min hew nihêrt ko li pêş min derîyek. Min lê nihêrî. Erê ew e. Wele hema min li dora xwe nihêrt ko kesek tuneye û firtê firtê û ellah ellah ez ketim hundur. Lê ez çi bibînim! Şaş mam, li xwe heyirîm. Hemû li dora min rêz bûbûn. Min hemû di ber çavan re derbas kirin. Lê na, nabe.

Min carê serê xwe di ber xwe de xwar kir, hinekî fikirîm, ponijîm, gelo ez çawa bikim! Wele min serê xwe rakir. Li pêş xwe nihêrt ko çi bibînim! Wele hema min xwe avêt ser, hişk pê girt û danî ber xwe. Min pêşî li binî nihêrt, erê, temam e. Eynî ew e. Wele hema min zû zû qeytanên wê vekirin, min ê xwe jî vekirin, min yên xwe danîn wê kêlekê, min ew girtin û kirin pîyên xwe. Lê çi heyf ew jî nebûn! Çîmkî ne 43 nimre bûn.

Axirê min îro jî ji xwe re cotek sol nekirîn.

Ardoyê Bêşimik (*Mîrkut*, no:1, 1985)

Nameyek ji bo xwendevanan*

Merheba ji te re!

Nuha saet 12'ê şevê ye û ez li ser computera xwe ji te re van çend rêzan dinivîsim. Berî wê min karê xwe dikir, jixwe tu zanî kar çi ye.

Bîstek berê spagettî ya ko min ji do de çêkiribû, min germ kir û xwar, heta sibê jî ewê îdare bike, ger xelas bibe jî Xwedê mezin e, bila canê hêkan sax be. Ma qey mirîşk nemirine! Lê heta tu werî ez hêkan nekim baş e! Gelo te zanibû ko hêkerûn xwarineke millî ya xwendevan û bêkaran e. Her çendî ez ne xwendevan im, lê muweqeten bêkar im.

De neyse lê, ev çi hêk bûn îcar di serê me re derketin, ma qey tiştekî din nema ko em behs bikin? Xwedê bela hêk û mirîşkan bide ko ev serê saetekê ye ketine nav computera min û jê dernakevin. Ji ber wê jî min ji bîra kir ko halê te bipirsim.

Heqet tu çawa yî? Baş î? Kêf hal? Êêêê! daha, daha, başqe başqe tu çawa yî? Diya te, xuşkên te, birayên te, biraziyên te, xwarziyên te, der û dor û cîranên te, hemû çawan in, baş in? Înşellah giş baş in. Silavên min li hemûyan ke. Têm destê mezinan, çavên biçûkan maç dikim.

Êêêê, hela bêje, daha başqe çi heye, çi tuneye? Dunya çawa ye, zad û genim çawa ye, pez çawa ye? Li vê derê hewa dûrimî ne baş e. Tu dibêjî qey tûwaleta melegên Xwedê qul bûye û bi ser bajarê me de dirije, her roj baran e, şilî ye, şilope ye. Welê xuya ye mewsimên salê serxweş ketine, li hev geryane, riya xwe şaş kirine, ji ber wê jî zivistana ko du meh berê xelas bûbû, dîsa bi paş de vegeriya.

Gerçî carna tav dixwaze serê xwe di ber ewrên reş û tarî re derxe û bibêje »vaye ez jî heme«, lê bi şîrqîna birûskên har, ji tirsa dîsa xwe davêje paş ewrên reş.

Bawerîya te ji Xwedê hebe, ji ruyê vê baran û şilîyê de, jirgî tu çûyî, min çar şemsîye, du cot sol, sê cot gore, du pantor, gomlegek û qocixek kevn kirin û avêtin. Nuha tenê şemsîyeyeke min maye ko ew jî orta wê qul bûye û cilên li ser min mane. Her çî cara ko ji bo kirrîna çar hêkên mirîşkeke xayin derdikevim derve, di wê qulika şemsîya min a qul re

barana dunyê wek çemê Dîcleyê bi ser min de tê xwarê. Neyse ligel hêkên xwe ez şil û şip têm malê.

Tu zanî şilbûn tiştekî ne baş e. Çimkî mirov pir zû bi nezlê dikeve. Lê ji alîyê din ve jî mirov ji şuştina cilan xelas dibe. Yan na, tu zanî ko li vî welatê gawiran şuştina cilan çiqas zehmet e; hê tu yê rabî cilên xwe derxî, bavêjî makîna cilan, derman têxê, pêl pişkoja wê kî, dereca wê eyar kî, seatekê li hêvîyê bisekinî, paşê derxî bavêjî makîna guvaştinê, pazde deqqan jî li hêvîya wê bî, pişt re dîsan derxe, girrr, girr, girr, bibe bavêje makîna zuhakirinê (qurutmê) nîv seetê jî li benda qurutmê bisekine, paşê dîsan derxe, qat ke, dûz ke, rast ke û bîne ûtî ke û dîsan qat ke û rake. De xwedê hebînî bêje! Yanê nuha barana ko bi ser min de dibare û min şil û şip dike, lê ji alîkî de jî cilên min dişo, ji vê zehmetîya cilşuştina modern baştir nîne?

Axx, dunya axx! Dîsa derd û kulên min rabûn. Jinê xelkê jî bila bibêjin em jin in. Jinên xelkê cilên mêrê xwe dişon, utî dikin, babet babet paste û xwarinan çêdikin, a min jî xwarina ko ez çêdikim dixwe û begem nake û bi ser de jî tebaxa xwe ranake û pişt re jî dibêje »ji min re çayê bîne!«. De were kirasê xwe neçirîne!

Min biryara xwe daye. Ez çend hevalên din ên wekî xwe bibînim, ezê Komela Mêrên Bindest deynim, daku em bikaribin li dij jinên zordest û serdest têkoşîna xwe ya mêranîyê bi pêşde bibin û di demên pêş de em dîsa bikaribin bibin serdest. Heqet bira-mirayên te, an jî merivên te yên mêr ko neheqî li wan dibe hebin, adresa wan ji min re bişîne belkî ew jî bibin endamê komela me, daku bikaribin bi riya komela me li heq û huqûqên xwe bigerin.

Wîîî, ma tu çima diqeherî, ma ez rastîyê dibêjim. Jixwe rastî tirş e. Carekê mêrekî rastîyek gotibû, jinên heft gundan berra wî dabûn ew ji gund qewitandibûn.

Neyse, neqehere. Tu mecbûrî derdê min bikşînî. Jixwe ez feqîr im, ez gune me, ez bê kes im, ez bê hal im, ma qet gunehê te bi min nayê. Li vê derê, li vî welatê gawirên wek zerika hêkê, bêyî te tu kesekî min tuneye. Diya min, birayê min, der û dor û cîranên min, heval û hogirên min hemû li wê derê ne, ma tu jî ji min bixeyidî ezê berê xwe bi ko de kim?

De neyse neqehere, bise ez ji te re pêkenînekê bibêjim, belkî kêfa te were cî:

Yek ji yekî dipirse:

— Gelo çend babet jin hene?

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Du babet, yek ji wan pir diaxife, ya din jî qet devê wê nasekine!

Ez dibêjim bi vê pêkenînê tuyê du kîlo bigrî, ne wa ye? Wexta ko tu ji vê derê çû tu 67 kîlo bû, ne? Îcar tuyê bibî 69 kîlo, Xwedê zêde bike û ji serê me jî kêm ke! Mêze, tu bawerîyê bi mêzînên wê derê neynî ha! Çimkî Dîyarbekir nuha pir germ e û tu zanî ji ber germa Diyarbekirê hesin jî dihelin, êêê mêzîn jî tu zanî ji hesin e. Mumkun e ew mêzîna ko tu hildikişî ser, giranîya te 50 an jî 52 rê dide, eman eman, nebe nebe tu bawerîyê pê bînî û bîlleheq jî kêfa xwe neyne. Çimkî mêzîna ko ji germa bihele, bawerî pê nayê. Û wekî tu jî dizanî, ji ber problemên kîloyên zêde gelek kes ketine buxrana psîkolojîk û har û dînolojîk. Ya baştir ew e ko havînan li vir, zivistanan jî li Diyarbekirê xwe biwezinîne da ko tu nekevî ber çerxa har û dînolojîyê. Bê guman ê min pêşniyar e. Te dî yanê aqil, jixwe ji berê de bav û kalan gotine »aqil ji aqila ustuntir e« û dîsa bav û kalan, nizanim ji bo kê gotine lê, gotine »aqilê sivik û barê giran«. Tu dîsa xeyidî? Na, nexeyide û neqehere, çimkî gotinên bav û kalan li ciyekî wek hedîsên pêxemberan e. Û divê em hurmeta wan bigrin, yan na mirov yekser diçe cahnimê. Û tu zanî Cahnime agir e. Mirov tê de dişewite dibe kizirik, ûfff pir pîs e! Xwedê me ji agirê cahnimê û ji kîloyên zêde bisitirîne.

Welle ez dibêm êdî bes e, çimkî xewa min tê, ez êdî nikarim dewam bikim. De hema kîloyan -pardon- silavan li herkesî ke, têm kîloyên mezinan û giramên piçûkan! Wîîî ev çi bû. De hema gelek silav.

Ez

18 Hezîran 1991

Stockholma Wêran û Xopan

— ———————————-

*Ev name di 18.06.1991-an de min ji hevjîna xwe M. Esmer'ê re şandibû ko wê wextê ew li Diyarbekirê bû. (*Armanc*, no:129, 1992)

Çend name

Nameyek ji Çînê

(Ev nameya jêrîn do êvarê ji me re ji Çînê hat. Di vê sedsala 20-an de bi xêra poste û telefonan, êdî mirov dizane ko li kuderê Kurd hene. Hûn bi xwe jî dê bixwînin daku li Çînê jî Kurd hene. Zimanê nameyê me neguhert, her wekî xwe ye; yanê bi Kurmancîya Çînê ye.)

Hevalêng hêngja!

Emg li vêng dergê ne gelek ing. Li gorg nifûngsa Çîngê emg engqelîyeteke pirg piçûng têng qengbûlg kiring. Çimkîng emg tenêng heftêng (70) milyonging. Mintingqa ko emg lêng dijîng, jêng re dibêjing »Çiyayêng Xûnang«.

Çeng rongj berêng me jî cejnga Newrozingê pîrozing kirg.

Dengbêjingê me yê bi naving û deng Şîng-Vang bi dengê xwe yê xweşing û tengbûringa xwe ya ringding sitranêng gelêrîng û folklorîng pêşkêşî me Kurdêng Çîngê kirg.

Hongzang Şîng-Vang di dawîngê de sitranga mengşûr Kînge Emg gotg û şev-aheng xelas bûng.

Her wengha li vêng dergê me jî Engstîngtûnga Kurdîng a Çîngê vekirg. Hûng dikaring hemû kovaring û kitabing û belavokêng xwe bişîning ser navnîşanga Engstîngtungê.

Ji bo hejmaringa dinga kovaringa we, emgê ji weng re gotaringekê li ser du nivîskaringêng me yêng mezing Mahn-Mungt Bang-Sîng û Meng-Metg Ung-Zing binivîsing ko kitabêng wangêng vê dawîngê li vêng dergê bi zimangê Çîngî jî derketing.

De heta mektûbinga ding, bimîning di xweşîngê de. Bi silavingên birangîyê!

Birangê we Şong-Reş Wang Yû - Çîng

(*Berbang*, no: 49, 1988)

Nameyek ji Çeneqqelê

Bismîlla,

Berîya ko dest bi mektûnba xwe bikim, silavên Xwedayê alemîn li ser we be. Têm çavê piçûkan, destê mezinan maç dikim. Hun çawan in? Baş in? Îşella hun baş in.

Ger hun li min bipirsin, hemd olsin şukur ji Xwedê re ez baş im, hema

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bila sihheta we di cî de be bo min bes e. Tek meraqa min hun in. Îşella hun jî baş in.

Êêêê, çi dikin, çi nakin? Çi hewadîs hene ji min re binivîsin. Li vê derê hewadîs mewadîs muhîm tuneye, dunya sar e.

Merivên me giş çawan in? Kî zewicîye, kî mirîye, kî maye? Zadê îsal çawa ye, çêre çawa ye, pez çawan in?

Ji kurxalê xwe Evdo re pir pir silavan dikim, têm destê wî û têm herdu çavên kurê wî Elo. Birayê min Mihyeddîn çawa ye? Li wî, li jina wî, li bûrayê wî, bacanaxê wî û cîranê wan bol bol silava dikim.

Wekî din jî li merivê me gişa, li yê ko ez nas dikim û nasnakim, li hemûya pir pir silava dikim. Ê ko vê mektûbê dixwîne, ê ko guhdarîya wê dike, li hemûya silava dikim.

Wekî din jî, yên ko min ji bîra kirine navê wan binivîsim, li gişan silava dikim.

Dîsa ê ko li min dipirsin û miraqa min dikin li gişa silava dikim.

Berîya ko mektûba xwe biqedînim, careke din li we gişan yeko yeko silava dikim, têm destê mezina, çavê piçûka maç dikim.

Emanetê Xwedê bin..!

îmze

Taqyeddîn - Çeneqqele

(*Mîrkut*, no:2, 1985)

Nameyek Ji Swêdê

Ev serê bîst salan e ko li Swêdê me. Dikana min, tirimbêla min û xanîyekî min heye. Ez dixwazim bizewicim.

Emrê min 44,5 e. Qama min 144,5 e. Giranîya min jî 44,5 e. Porê min hîn neweşîyaye. Lê divê ez rastîyekê bibêjim ko çend tayên sipî ketine nav porê min, lê tişt nabe ezê bi boyaxa Awrupayê boyax kim.

Li benda boyaxa we, pardon bersiva we me!

Hevdesipî Limalmayî

Stockholm

Nameyek Ji Diyarbekirê

Em çend Kurdên welatparêz wek taban (yanî endam) li bajarê Diyarbekirê gihîştin hev, me rêxistina xwe ava kir.

Navê rêxistina me PKBS (Partiya Kurdên Bê Serok) ye, çimkî me hîn ji xwe re serokek nedîye.

Rica me ji serokên bê taban ên li derveyî welêt ew e ko ger tu karmarekî wan î din tunebe, bikaribin werin serokatîya me bikin. Ger serokên bê taban nemabin, yekî ko tecruba wî hebe û wext-î zemanin de ji bo seroktîyê ji partîya xwe veqetiyabe jî dibe.

Navê partiyê jî, piştî ko me serokek dît em dikarin di kongrê de biguherin. Pêşniyara me endaman ew e ko navê partiyê disa wek PKBS bimîne, lê li şûna Bê emê Bi binivîsin, yanî Partîya Kurdên Bi Serok.

Li ser navê endamên
Partiya Kurdên Bê Serok
(PKBS)
Mihemmed Hesen Herendam
Diyarbekir

Nameyek Ji Îstenbolê

Rojûnûz baş olsûn ey Kovar-î Armanc'in Beroş namiyle namîdar quncikîyle xebat eyleyen hevaller. Bendenîz zikmak dîlî Turkçe olan bîr Turkum. Ji ber vê yekê den dolayi, mecbûren sîze Turkçe nivîsîyorum. Hêvî we rîcam odur kî bu name-yî xwendevanimi zimanê Kurdî'nin Kurmancî lehçesîne wergerleseniz zêde memnûn olûrûm.

Çimkî ben çox fîkîrledîm, baxtim kî Turk çepinde bîr xêr yoxtir, ji ber wê sedemêden dolayi onlardan devjêberdan eyledîm we şîmdî de daxwazim Kurd çepîne nêzîk olmaktir.

Her cûre kar û bariniz de serkevtî olmanizi Xuda-yî alemden daxwaz eyler we şîmdîden dil û can île tum sipaslarimi pêşkêş eylerîm efendîm.

Selamlar Efendîm
Alper Şoreş-Îstenbol

Nameyek Ji Şamê

Rifaqên me yên 'ezîz di mucella Mîrkut de.

Bi sereha ez gellekî besitîm ko min mucella we xwend. Lî ennehû wexta ko mucelleyeke fukahî bi zimanê Kurdî izdar dibe ya'nî tetewireke melhûz di tarîxa sefahet el-Kurdî de tê încaz kirin.

Ez bi xwe şexsen kitîr temennî dikim ko hûn her daîm û kul yewm

îstîmrar bikin.

Her biye-îşe mucellet-ul Mîrkut !

Remezan El-Torevanî el-Kurdî/Dimişq (Şam)

*

Bersîvûha (yanê bersiva me)

El bersiv el-mucellet ul-Mîrkut min bajar el-Stockholm.

Heval el-xoşewîst

Yûdil geşûna ennû bersivûke, 'ela gotinûkatûke el-bî heyat w'el-giranat el ko nayên hilgirtin we nayên daqurtandin.

Çimkî nametûka ket fî destûna, fe kul xwendevanûna têdinegihîştûna. Fe ennû daxwazû min ke en tu were me'a nametûke fî cartên,yan jî hîn bibe zimanûke.

El beşet ul-vegerandin fî kovaret el-Mîrkut

(*Mîrkut*, no:3, 1987) (Armanc, no:130, 1992)

Kontax yan jî qontax

Divê xwendevan çewt fam nekin. Çimkî qontax du maneyên xwe hene:

1-Dîn, rentele, beredayî, şêt, perçe, xînt.

2-Têkilî, peywendî, hevûdunaskirin.

Em li vê derê kelîmeya Qontaxê di maneya têkilî, peywendî û hevûdunaskirinê de bi kar tînin. Ji ber wê yekê, divê ko xwendevanên me yên baqil zanibin û nekevin çewtîyan. Her weha divê ko dîsa xwendevanên me yên baqil (ne dîn) ji xwendevanên nebaqil (dîn) re vê yekê bibêjin daku bila ew jî nekevin çewtîyan.

1-Hewlêr-kod M.Q. 361

Min kiçêkî zor qij zerd im û hemîşe kurd im. Temenim emroke bûwe be 36, belam min wa ezanim ke eme rast nîye, xelet e. Çunke katê ke min le dayik bûme, ew wexte bawkim le cenûbî îraq kar dekird, daykim le şwênî bawkim çûwe bo daîreyî nufûs we le wê tarîxî ledayikbûnî min nûsrawe ke min delêm eme xelet e, debê temenim 35 be.

Belam eme girîng nîye, 35-36 ferqî nîye. Êsta min le Swêd dejîm. Min zor hezî le natur wate tebîet û musîqayî xerbî dekem. Zor pêm xoş e ke le gel gence kurdekanman têkilayî wate peywendî bidozimewe. Êwe detiwanin namekantan le ser em kode »MQ-361« be kurdî, îngilîzî, swêdî, ferensî, elmanî, erebî û farisî binêrin.

Awatim namekantan e!

2-Qerejdax-Malxirab-371

Ero ez tebiî mi, salê mi 26 i, çi weri ber devê mi dibêm. Dixwazim bi keçikeka gi çi tê ber devê wê dibê re qontaxê deynim. Hoby'ên mi; keçika gi ji mi ra mektûbê bişîni ji çi hez biki, ezê jî ji wan tiştan hez bikim. Li hêvîya mektûba we mi. Hinkî zû..!

3-Mêrdîn-Mutewazî-381

Ez qeble ewwel xort, lê elan 'emrewasat im. Ji aîleyeke mutewazî me.

Dixwazim bi keçeke ko ji aîleyeke mutewazî hatibe re elaqet el-heyat el-tewîl bisicilînim. Ez li bendî mektûbên we me.

Bî sur'a biersilînin..!

4-Qonye-Ezî Kurd im-391

Ezî Kurd im. Yaşê min 30 e. Ez arasira duşunmîş dibim ev heyat wengî nabe. Ev ne yaşamax e, yaşamax dêdixin gereke merî qontax yapmîşke, însanan tanimîşke. Bo tanimaxê jî gereke em ji hev ra yazmîş bikin. Ez mektûbê we beklemîş dikim.

Yazmîşkin..!

5-Dîyarbekir-Keko-401

E jî kurd im, tu jî kurd î, de bişîne haa! Ma tu li wê, e li vê, tu jî zanî, e jî zanim, xwedê jî zane. Ma niza tu li hêvîya çi yî?

Muzîk: e jî hez dikim.

Tebîet: weleh, e ji wê jî hez dikim.

Dans: boy xatirê te ew jî erê.

Bob Marly: nizam çi ye, lê ew jî erê.

Elvîs Presley: erê erê, ew jî erê, de bişîne haaa..!

(*Mîrkut*, no:1, 1985)

Kurtejiyana min

Di gelek rojname û kovaran de, li ser bergê paşî yê hin kitêban, bi navê »jiyana wî«, »jiyana min« an jî »kurtejîyana min« nivîskarên me behsa jîyana xwe dikin.

Nivîskarên xelkê wexta ko behsa »kurtejîyana« xwe dikin tenê bi kurtî behsa nivîskarî û berhemên xwe dikin. Lê yên me? Yên me ji zarotîya xwe dest pê dikin, behsa bapîr û kalikê xwe, behsa rêwîtîyên xwe yên bo hin bajaran, behsa tarîxa Kurdan dikin, behsa şerê Şêx Seîd, serîhildana Dêrsimê, şerê Îran û Iraqê, şerê Lubnanê û hîn gelek tiştên din dikin. Yanê nivîs ji kurtejiyanê derdikeve dibe tiştekî din; dibe »dirêjejiyan«.

Îcar ji ber wê yekê ez fikirîm min got eger bi vî awayî be ezê jî »kurtejiyana« xwe binivîsim. Di vê »kurtejiyana« min de tu derew û mubalexeyek tuneye. Min jî bi rastî »kurtejiyana« xwe nivîsîye, lê bi awayê wan hevalan. Belê ev e kurtejiyana min:

***

»Kurtejiyana min«

Yekem rojnama Kurdî di 1898-an de li Qahîrê derket, 56 sal piştî derketina rojnama Kurdistanê ez li hêla Qerejdaxa şewitî ya ko ji sitranan re bûye mesela herî sereke, di nav eşîra Kejan de li gundê Şêxulîya Jêrin a bi dar û ber û şîn û şênahî, di şeveke reş a zivistana tarî de, di pûk û serma û ba û bahoz û berf û baranê de, di odeyeke xanîyekî kevn-î kevnare yî nîv xerabe de, bi alîkarîya hin jinepîrên gundê me yê wêran û xopan, hatime vê dunya û cîhan û gerdûna qehr û hesret û elem û êş û kul û derdan.

Bi hatina min a dunyê re jinepîrekê derhalkê mizgînî gihandiye bavê min. Bavê min jî li gor ʻerf û adet û toreyê Kurdan di oda tijî mêvan de rabûye ser pîyan û dîsa li gor adetên Kurdên ko ji wan re kur çêdibe, pêşî destê xwe avêtiye debança xwe ya »belçîqa«, jarjurek tijî bi hewa de vala kirîye, paşê jî ji bêrîka xwe li gor perê wê wextê 50 lîre derxistîye daye pîrejinê.

Gundî û meriv û nas û dost û heval û hevrê û hogirên bavê min yên ko li wê derê bûne kêfa gişan hatîye. Herkesî yeko yeko, hinekan jî bi hev re

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bavê min pîroz kirine.

Ez hê di pêçekê de bûm ji alîkî de diya min, ji alîkî de jî pîrika min û carna jî kalikê min û car carna jî, eger bi mêvanî bihata, xalê min guhên min ên nuh û nerm û sorik û nazik bi sitran û çîrok û lorîkên me yên folklorîkên kevn ên ko bermaye û mîrasa kultura me ya pênc hezar salî bû, tijî dikirin.

Li gor diya mina renckêş û ezîyetkêş û reben û dilovan; ez hê heşt mehî bûm bi ser niga ketim. Li gel şîrê diya xwe û carna jî yê mange û bizinan, ez bi lîstikên me yên folklorîk ên zarokan û bi Mewluda me ya Kurmanckî

»Hemdê bê hed bo Xudayê alemîn

Ew Xudayê daye me dînê mubîn« mezin bûm.

Emrê min bû şeş, li Tirkîyê înqilaba eskerî çêbû. Di destpêka înqilaba eskerî de ko Cemal Gursel bû serokê Tirkîyê, min jî dest bi mektebê kir. Di mektebê de ez pir zîrek û jêhatî û lêhatî û şek û pek û çapik û zane bûm. Her çendî di wî emrî de haya min ji fîlozofê me yê millî Ahmedê Xanî û şaîrê me yê sofî yê klasîk Melayê Cizîrî û nivîskar û şaîrên navdar û meşhûrên biyanî yên wek Sadîyê Şîrazî, Xeyam, Victor Hugo, J. J. Rousseau tunebû, lê dîsa jî meraqa min her li ser edebîyat û hunera bilind bû. Çimkî min her dixwest ez li ciyên bilind rûnim. Ji ber wê yekê ez her tim diçûm ser kevir û gome û zinar û mit û lat û teht û nehîtên bilind û min ew sitranên me yên hezar salî yên ko ji kûrahîya taristana tarîxa me hatibûn gehîştibûn vê rojê ko nuha ji alî hin folklorîstên me ve tên berevkirin, digotin.

Pêşî hevalên min, paşê mamoste û piştî wan gundîyên me û piştre jî bavê min lê varqilî ko ez gelekî zîrek im, ji bo xwendina min, rabû mala me barkir bir Diyarbekira xopan a serberjêr a bi qele û sûr û beden a li ber çemê Dîclê ko di wexta xwe de di bin serokatîya Şêx Seîdê Pîran de Kurdan serî hildabûn. Min got serîhildana Şêx Seîd divê ko ez behsa kalikê xwe jî bikim.

Kalikê min di serîhildana Şêx Seîd de li gund bû. Her çendî ew neketibû şer, lê ez bawer im heke têketa şer, ewê biba qûmandarê Paloyê. Lê li gor gotina apê min ê Seydo, giş ji ruyê pîrika min Etê de bûye ko kalikê min neketîye şer. Çimkî pîrika min a Etê pir ji kalikê min hez dikir, ji ber wê jî xwestîye berî ko here şer ji kalikê min re nanê şikeva lêxe. Rabûye hevîr kirîye, agir dadaye, sêla xwe avêtîye ser agir û nan lêxistîye. Nanê pêşî yê germ li gel rûnê nivîşk daye ber kalikê min. Kalikê min di

gepa pêşî de bi ser pîrika min de qîjîyaye û gotîye »Nanê te bê xwê ye!«. Pîrika min a Etê jî gotîye »Na!« Li ser vê yekê yek ji wî û yek ji wê, pêşî bi devkî, paşê bi hundukî û gurmikî û kulmikî, piştre jî pihînkî li hev xistine. Kalikê min serê pîrika min şikandîye. Pîrika min bi wê xwîna serê xwe berbi mala birayên xwe reviyaye. Kalikê min jî daye dû wê. Birayên pîrika min derketine rasta gund, xwe li kalikê min rakişandine, xwestine li kalikê min xin. Lê birayên kalikê min jî xwe bi kalikê min re gîhandine. Pêşî bi çoû daran, paşê piçekî ji hev dûr ketine, îcar bi keviran û dû re jî bi tifingên »çaplî« û »almanî« repandine hev.

Sê birayên pîrika min û du birayên kalikê min û çar gundîyên ko ketine navberê di vî şerî de birîndar bûne. Berbi êvarê şer rawestîyaye. Herkesî birîndarên xwe birine malê, birînên wan kewandine û pêçane. Paşê nêzî nîvê şevê rîsipî û axalerên eşîrê li hev civîyane.

Dilê min liyane, dilê min liyane. Wîîî! Ev çi bû? Bibexşînin min got qey ez stranan dibêjim!

Belê, fikirîne, ponijîne. Birine anîne, wezinandine, kişandine. Çi bikin, çi nekin, bi çi awayî her du serîyan li hev bînin. Rîsipî û axaleran bi herdu alîyan re qise kirine. Herdu alîyan birine, anîne, pîvane, wezinandine. Paşê bi raya gişan çar ga û du mange û sê mî û du beran û bizin û karikek û du mirîşk û bîst û çar hêk li kalikê min wek ceza birîne. Kalikê min derhalkê ban bavê min kirîye. Bavê min yekser çûye cezayê kalikê min anîye daye mala bavanên pîrika min. Kalikê min jî bi çeplê pîrika min girtîye anîye malê. Wê şevê bi hev re deng nekirine. Roja din jî bi hev re deng nekirine. Ji ber vî şerê di navbera kalikê min û bavanên pîrika min de, kalikê min ji bîra kirîye ko wê biçûya têketa şerê Şêx Seîd.

Hetta van salên dawîn jî -ez bi xwe jî giham ser- kalikê min û pîrika min wexta ko behsa Şerê Şêx Seîd dibû şer dikirin. Kalikê min pir li ber vê yekê diket û bi ser pîrika min de diqîjya.

Neyse em dîsa vegerin ser meselê. Belê, li Dîyarbekir em li taxa mala Cemîl Paşayê bapîrê Qedrî û Ekrem Cemîl Paşa yên ko demekê li Sûrîyê di 1932-an de li gel rehmetîyê Celadet û Kamûran Bedirxan kovara Hawar derdixistin, diman. Gerçî piştre kovarên Ronahî û Roja Nû jî derxistin, lê ji ber ko ez behsa »kurtejîyana« xwe dikim, ezê nuha nekevim nav wan meseleyan.

Belê, em li ko mabûn! Temam nuha hat bîra min: kurtejiyan! Erê »kurtejiyan« e, lê welê xuya ye, ê min jî wek yê hinekan piçekî dirêj bû. Îcar di rojnamê de cih jî tuneye ko vê kurtejîyana xwe piçekî din dirêj

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bikim. Ji xwe ez texmîn nakim ko redaksîyon jî bihêle. Ji ber wê yekê ezê behsa hin dewreyên jiyana xwe nekim, ji xwe ne pêwîst e jî ko ez rabim bibêjim min mektebên seretayî (ilkoqil), navendî (orteoqil) û lîse û unîversîte li Diyarbekirê xwendine. Her weha ez ê behsa dewra DDKD'yê jî nekim ko di 1977-an de me li Diyarbekirê ava kiribû. Ji xwe di 1980'yî de bi hatina Cûntayê re ew jî hat girtin û ji ruyê vê komelê de polîsan ez girtim, li Çarşîqereqolîya Diyarbekirê bi êzingan li min xistin, parsûyên min ên alîyê rastê hê jî ji ber wan lêdanan diêşin. Min gelek îşkence dît, îşkenceya ko min dît bila qet neyê-pardon bila were- serê dijminê min. Eger hûn ji min bawer nakin, herin ji wê xanima ko li Xaça Sor kar dike bipirsin, ew bi êşa min dizane. Neyse, qet mepirsin yan na ezê jî bi navê »di îşkencê de nîv saet« kitêbekê binivîsim.

Nivîskarîya min hê ez şeş salî bûm dest pê kir. Cara pêşîn min bi qelema reş li ser kaxeza sipî navê xwe nivîsî û mamoste ji min re got »aferîn!«. A ji wê rojê de ye ez her dinivîsim. Ji mektûbên eşqê û yên eskeran bigrin heta bi lotto û totoyan ez dinivîsim.

Di destpêkê de meraqa min pir li ser helbestan bû. Lê bavê min û diya min nedihîştin ko ez helbestan binivîsim. Her çendî xwendin û nivîsandina wan tune bû jî, lê daxwaz û meraqa wan her ew bû ko ez roman û çîrokên pir dirêj binivîsim. Hela tew pîrika min, wê jî digot »binêre lawo, gerek tu romanên welê binivîsî ko ji yên Viktorê Hugo jî baştir bin!«.

Dîsa jî her wexta ko fersend bi dest min biketa, min bi dizî helbest jî dinivîsand. Lê min ji tirsa dê û bavê xwe û bi taybetî ya pîrika xwe, helbestên xwe dikir ber doxîna xwe, di pizîya derpîyê xwe de vedişartin. Rojekê dîsa min û zarokên kuçê me ji xwe re li derve dilîst, helbestên min jî di ber doxîna min a lastîkî de bûn. Û çima lastîka doxîna min neqetîya! Wele ji fedîya ez reviyam malê, min şalê xwe guhert. Paşê lê varqilîm ko ew helbestên min ên ko di pizîya doxîna min de bûn hemû ketine. Hema yekser ez revyam derve ciyê lîstikê, ez li helbestên xwe geriyam. Lê çi heyf ko bayê lêxistibû, hemû bi hewa de firyabûn, çûbûn. Ji wê rojê de ye ew helbestên min ên ber doxînê ji min re bûne kul û derd, nayên bîra min jî ko çawa bûn, belkî min bikarîba ji nû ve binivîsanda. Hema sernavên wan jî heba bes bû. Ger ew helbestên min ên ko ji pizîya doxîna min ketin û wenda bûn, nuha hebana ez bawer im, di edebîyata Kurdî de rewşa helbestan wê nuha ne welê qels bûya.

Di 1976-an de çar kitêbên min ji cildçî derketin. Ya pêşî li ser Fîzyolojîyê bû, yên din jî li ser Botanîk, Bîyokîmya û Mîkrobîyolojîyê

bûn. Çîroka van kitêban jî weha ye: Me hê nuh dest bi van dersan kiribû, kitêbên çapkirî tunebûn. Mamostên me wek teksîr nivîsên van dersan li me belav dikirin, me jî dibir ser cildçî hem cild dikir û hem jî navê xwe bi herfên zêrîn an jî zîvîn li ser wan dida nivîsandin. Belê bi vî awayî gelek kitêbên min derketin, lê nuha navên wan nayên bîra min.

Berhemên min ên çapnebûyî gelek in. Ji ferhengên Kurdî bigrin heta bi astrolojî û folklorolojîyê, ji 200-î zêdetir kitêbên min ên di heşê min de ji çapê re amadebûyî hene. Eger ez nav û sernavên wan rêz kim mumkun e deh rûpelên Armancê bigrin. Ji ber wê ez hewce nabînim binivîsim, lê eger rojekê fersendek din a weha têkeve destê min ez ê qala wan jî bikim.

Belê, piştî 1980'yî cûnta eskerî hat ser hukum, ez jî wek gelek Kurdên din ji mecbûrî ji welêt derketim hatim Sûrîyê. Wexta ko ez li Sûrîyê bûm şerê Îsraîl û Ereban her berdewam bû. Paşê çûm Lubnanê, li wir jî her şer bû. Ji xwe her wê salê bû ko Îngilizan avêtibûn ser giravên Falklandê. Û Enwer Sedat jî hatibû kuştin. Di vê navberê de min her dixwend û dinivîsand. Çunkî min hê ji biçûktî de kiribû heşê xwe ko ezê bibim nivîskar an jî romannivîs.

Ez demekê li wan deran mam, di vê mayina xwe de ji alî edebî, kulturî, civakî, tarîxî, siyasî û folklorî ve ez gelekî pêşde çûm û pir jî pijîyam, heta ez welê pijîyam ko êdî çermê laşê min dihat xwarê. Lê êvarî berî razanê min mast di laşê xwe dida piçekî êşa wî disekinî. Carna jî dibû vizîna çend gulle û mermîyên Îsraîlî û Ereban ko di ber guhên me re dipekîyan, lê dîsa jî hewayeke edebî û entellektuelî hebû. Mesela, carê tê bîra min, me şorba nîska dixwar û her weha me munaqeşeyek jî li ser edebîyata pir bilind a Kurdî û biyanî dikir. Em welê bi munaqeşeyê de ketibûn ko haya me ji kevirên nav şorbê tunebû ko me ew jî pê re dixwarin. Ji xwe ji ber wê şorba nîska ye ko nuha du diranên min ên qîl şikîyane. Gerçî ji bo çêkirina wan min muracaatî Xaça Sor a Swêdê kirîye. Îcar eger bikaribim bidim îspat kirin ko diranên min ji ber bîr û bawerîyên min ên sîyasî hatine şikandin, ewê alîkarîya min bikin.

Ez dibêjim qey ez piçekî ji meselê bi dûr dikevim. Lê na, na! Qet xwe aciz mekin, ez ê ji vê û pê de pir kurt bibêjim. Belê, paşê hatim Swêdê. Piştre çûm Parîsê, dîsa vegeryam Swêdê. Nuha li Stokholmê dimînim. Di redaksîyona Armancê de kar dikim.

Ji xwe ez dibêjim hewce nake ko ez rabim bibêjim ko ez bi Kurdî (Kurmancî, Dimilî, Soranî, Şêxbizinî, Hewramî, Feylî), Tirkî, Swêdî, Fransî zanim. Gerçî wextekê ez çûbûm kursa Erebî, Farisî û Îngilîzî jî lê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

emê wan hesab nekin. De-mekê jî hin hevalên min ên Îspanyol û Rûs hebûn, wexta wan bi zimanên xwe qise dikirin min jî guh-darîya wan dikir, yanê guhê min ji wan zimanan re jî ne xerîb e. Lê ez dibêjim emê wan jî nehesibînin.

Nuha hûn ê bibêjin qey ez pesnê xwe didim, ma ji xwe gundîyên me hemû min nas dikin, ne hewce ye ko ez behs bikim. Bi qasî ko gundiyên me min nas dikin, ez bawer nakim ko Ewrûpî û Kurdên li derveyî welêt min nas bikin. Ji xwe di nav eşîra me de malbata herî navdar em in û di nav malbata me de jî yê herî bi nav û deng ez im. Çimkî bavê min şofêr bû. Ez jî telebe bûm. Axirkê, yanê te dî eyb e ez nuha rabim pesnê xwe bidim, lê te dî yanê ez ji malbateke navdar im û bi ser de zewicîme jî.

Gelo nizanim pêwîst e ko ez behsa endametîya xwe ya PEN'ê û Yekîtîya Nivîskaran bikim? Ez dibêjim na! Eyb e! Ji xwe herkes dizane ko ez endamê Amnesty, Partiya Sosyal Demokratên Swêdê, Federasyona Kurdan Li Swêdê, Komela Kurdan ya taxa me, Xaça Sor, Komela Kirêçîyan, Komela Mamostan, Komela Beledîya taxa me û hîn gelekên din im.

Belê, ez zanim pir kurt bû, lê ji xwe navê wê li ser e: »kurtejiyan«.

(*Armanc*, no:135, 1993)

Ji % 98-ê ronakbîrên me ji tirkî hez dikin

Li Kurdistana Bakur di salên 1913-an de ronakbîrên Kurd li Îstenbolê bi navê Yekbûn, Jîn, Rojî Kurd, Hetawî Kurd gelek rojname û kovar derxistin. Zimanê rojname û kovarên wan nîvî bi Kurdî û nîvî jî bi Tirkî bû. Paşê hêdî hêdî tenê bi Tirkî, an jî hin nivîs jê bi Kurdî derxistin.

Bi qasî ko em pê dizanin, ji destpêka 1900-î heta 1980-î li Kurdistana Bakur, Kurdan 76 kovar û rojname derxistine ko ji wan tenê yek xurû bi Kurdî bû, ew jî di 1979-an de bi navê Tîrêj derket, yên din dîsa hemû bi Tirkî bûn. Yanê ji % 99 bi Tirkî, ji % 1 bi Kurdî derketine.

Piştî 1980'yî Kurdan dîsa dest bi derxistina rojname û kovaran kirin. Ji 1984-an û vir de li Kurdistana Bakur nêzîkî 40-50 kovar û rojnameyên Kurdî derketin ko ji wan hinek hê jî berdewam in. Lê ji nav van tenê Rojname û Welat ne tê de, yên din dîsa hemû bi Tirkî ne.

Çi ecêbek mezin e, bifikirin, milletekî nêzîkî 15 mîlyon însan, di nav 6-7 salan de ronakbîrên wî milletî bikaribin 40-50 kovaran derxin ko tenê du heb ji wan bi Kurdî bin, yên mayî bi Tirkî bin. Yanê ev tê wê maneyê ko ji % 98'ê ronakbîr û nivîskarên Kurdan naxwazin bi Kurdî binivîsin, bi Tirkî dinivîsin.

Îcar milletê me yê feqîr jî dixwaze bizanibe ka ronakbîrên wî çi dibêjin. Lê ji bo ko ji ronakbîrê xwe fêm bike divê ko pêşî fêrî Tirkî bibe. Yanê bi nezanî em milletê xwe asîmîle dikin. Îcar li alîyekî din jî em radibin fortê xwe didin û dibêjin »gerek em li dijî asîmîlasyonê rawestin«. Yanê çi? Gotinên hîç û pûç!

Li gor reqemên ko me li jorê nivîsîne Kurdên Kurdistana Bakur ji destpêkê heta nuha nêzîkî 132 kovar û rojname derxistine ko ji wan tenê 3 heb bi Kurdî ne. Û rewşa zimanê me jî li ortê ye.

De îcar eksê wê bifikirin. Gelo ji wan 132 kovar û rojnameyan ger sê heb tenê bi Tirkî û yên mayî jî bi Kurdî bana, ma rewşa zimanê me wê wek îro ba?

(*Armanc*, no:133, 1992)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Dewleta kurdî ya federe û dewletên kûkla..

Eman gidî zû kin, lez kin şîyarbin, dewleteke kûkla li Rojhelata Navîn ava dibe, ev dewleta kûkla ko bi destê emperyalîzmê çêdibe tahlûkeyek gelek mezin e ji bo me Kurdan, çunkî wê TV ya wan bi Kurdî be, mekteb bi Kurdî be, leşker wê bi Kurdî talîmê bikin, yanê bi kurtî wê her tiştê wan bi Kurdî be, îcar ev yeka jî ji bo me talûkeyeke mezin e.

Çimkî em ji xwe re carê fêrî Erebî, Tirkî û Farisî bûne, ji mektebê bigre heta karên xwe yên burokratîk jî daxî bi zimanên wan dikin. Ev nîmetên hanê wê hemû ji destê me herin. Zarokên me wê îcar dev ji van zimanan berdin dest bi Kurdî bikin.

Edebîyat û tarîxa Erebî, Farisî û Tirkî ya ko me heta nuha dixwend ewê ji ortê rakin, li şûna wê, ewê dest bi xwendina tarîx û edebîyata Kurdî bikin, wê fîlimên Kurdî çêbikin, tiyatroyên Kurdî çêbikin, yanê wê Kurda bikin wek millet. Ev yeka jî wê bibe problem ji bo me ew Kurdên ko enternasyonalîst in, lê hê şuûra wan a millî peyde nebûye. Ji ber wê yekê divê ko em li dij vê dewleta federe derkevin.

Çimkî Emperyalîzm dixwaze vê dewletê ava bike. Wekî ko di wexta xwe de wek vê dewletê li Asya û Afrîkayê jî gelek dewletên weha yên kûkla avakirin ko nuha hemû li serê dinyê bûne bela. Ji ber wê jî bi min divê ko em ne tenê li dij dewleta kûkla ya Kurdan her weha em li dij dewletên ko wext-î zemanin de wek kûkla hatine avakirin, li dij wan jî derkevin.

Yanê nuha ev Iraqa ko heye, di wexta xwe de kûkla bû ji alî Îngilîzan ve hatibû avakirin, Kuweyt, Bahreyn, Urdun, Lubnan, Îsraîl, Cezayir, Tunus, Surîye û hîn gelek dewletên din ko di wexta xwe de ji alî emperyalîzmê ve hatibûn ava kirin divê ko em ji bo hilweşandina wan jî şer bikin, yan na, wê dunya ji ber van dewletên kûkla berbi xerabûnê ve biçe. Loma divê ko em hemû bi hev re dunyayê ji van dewletên kûkla xelas bikin.

Bijî dunya me ya xweşik û gulover û topik!

Bimre dewletên kûkla-mûkla û xwaro-maro û nexweşik û nerindik!

(*Armanc*, no:132, 1992)

Bira bira ye bazar cuda ye

Muslumanan digotin: eman gidî divê em musulman hemû bi hev re li dij gawiran şer bikin.

Me jî got: baş e! Û me û birayên me yên Erebên musulman me bi hev re li gawiran xist, paşê jî van birayên me yên musulman li me xistin..!

Kemalîstan digotin: eman gidî dîn ji dest çû, welat ket bin lingê îşxalkeran, birayên Kurd werin em bi hev re li van îşxalkerên gawir xin.

Me jî got: baş e! Û me bi hev re lêxist. Paşê van birayên me yên musulman jî li me xistin.

Xumeynî digot: eman gidî welat û dîn ji dest çû, birayên Kurd werin em bi hev re li dij Şahê kafir û xwînrêj şer bikin!

Me jî got: baş e! Û me bi hev re Şah ji ser text xist. Paşê birayê me yê Xumeynî yê musulman jî li me xist.!

Nuha jî nevîyên wan birayên me yên musulman rabûne dibêjin eman gidî welat ji dest çû, bi Hêza Çakûç emperyalîstên gawir dixwazin welatê me îşxal bikin, divê em li dij derkevin. Werin em bi hev re li wan xin..!

Û çi heyf ko îro jî hinek Kurdên me yên ji alî mêjî û heş de belengaz û nezan hene ko hê jî ji tarîxa xwe ders negirtine û dixapin û li dû wan diçin, dibêjin qey bi rastî 1500 eskerên Hêza Çakûç welatê me îşxal kirîye. Ma Kurdistan ji xwe di bin îşxala Tirkan de ye, êdî Amerîkayî hatîye çi ye, Fransiz hatîye çi ye?

Temam e, baş e, me qebûl e, em û xelkên din em giş birayên hev in. Lê gotineke pêşîyan heye dibêje »Bira bira ye, bazar cuda ye«. Yanê divê ko herkes li menfeeta xwe ya millî binêre, li gor menfeeta xwe ya millî hereket bike. 1/12/1992

(*Armanc*, no: 134, 1992)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Emê kengî li xwe mukur werin?

Mîr Bedirxan di salên 1840-î de hema hema dewletek avakir, lê piştî demekê bi dek û dolabên Osmaniyan Kurd bi hev ketin, Yezdanşêrê biraziyê Mîr Bedirxan li dij Mîr Bedirxan rabû û ev dewlet jî ji navê rabû.

Yezdanşêrê biraziyê Mîr Bedirxan îcar li dij Osmaniyan serî hilda, wî jî dikira dewleteke Kurdî ava bikira, lê dîsa Kurd bi hev ketin, Osmanî bi ser ketin.

Şêx Ubeydullah rabû, wî jî ji bo avakirina Kurdistanekê xebatek mezin kir, lê piştre Kurd bi hev ketin, Osmanî bi ser ketin.

Îsmaîl Axa Simko rabû, nîvê Kurdistana Îranê û heta Kurdistana Tirkîyê di pratîkê de di bin kontrola wî de bû, lê bi dek û dolabên dijmin Kurd bi hev ketin û Faris bi ser ketin.

Şêx Seîd rabû, nîvê Kurdistana Bakur ket bin hukmê wî. Lê piştre Kurd ji hev ketin û Tirk bi ser ketin.

Şêx Mehmûdê Berzencî rabû, melîkîya xwe îlan kir, li ser navê Kurdistanê pûl derxist, lê ji ber dek û dolabên Ereb û Îngilîzan, Kurd zû bi hev ketin, Ereb û Îngilîz bi ser ketin.

Îhsan Nûrî rabû, ala Kurdan li serê qotê çiyayê Agrîyê çikand, lê bi dek û dolabên Tirk û Farisan, Kurd bi ser neketin.

Seyid Riza rabû, nîvê Kurdistana Bakur di bin hukmê wî de bû. Lê bi dek û dolabên Tirkan, eşîrên Kurdan bi hev ketin, Tirk bi ser ketin.

Qazî Muhemmed rabû. Li Mehabadê Cumhû-riyeteke Kurdî hat avakirin. Lê dîsa bi dek û dolabên dijmin yekîtîya Kurdan belav bû, Kurd bin ketin, Faris bi ser ketin.

Mele Mistefa Barzanî rabû, Kurdistana Iraqê giş di bin hukmê wî de bû, lê bi dek û dolabên Şahê Îranê û Erebên Iraqê, Kurd dîsa bi bin ketin û Ereb û Faris bi ser ketin.

Qasimlo rabû, di 1979-an de Kurdistana Îranê azad bû. Lê piştre ji ber hin pirsên hûrik-mûrik Kurd bi hev ketin û melleyên Îranê bi ser ketin.

Nuha jî li Kurdistana Iraqê Kurd xwedî hukum in. Di kar û bar û kirinên xwe de bi her awayî azad in. Di resmîyetê de wek dewlet nehatibe

qebûlkirin jî, lê di fealîyetê de wek dewletekê kar dike. Lê çi heyf ko dijmin dixwaze vê hêvîya me ya dewletbûnê ji navê hilîne. Ji bo wê jî fesadîyê dixe nav me, me bera hev dide.

Û piştî hewqas tecrubeyên me yên tarîxî, hê jî em li xwe mukur nayên, heşê me nayê serê me. Dîsa bi dek û dolabên dijminên xwe û ji ber hin dijminatiyên hîç û pûç em bi hev dikevin û menfeeta xwe ya giştî ya netewî dixin bin piyan.

***

Marko Polo:«Kurd pir cengawer in, carna hin eşîrên wan bi hev dikevin, bi sedan kesan ji hev dikujin«.

***

Gotina Kurd di Farisî de tê maneya »qehreman, xurt, jêhatî, cengawer«, xwezika bila Faris xurt û cengawer bûna û em jî ne cengawer û xurt lê dewlet bûna.

(*Armanc*, no:149, 1994)

Li Ewrûpayê şeqîn û repîn e

Di nav van 15 rojên dawîn de 7 partî, 23 komele, 4 Enstîtu û 3 Akademî hatin avakirin. Du partîyên ko par hatibûn avakirin çarşemiya çûyî bûn du şeq. Nuka her şeqek nigekî -pardon- serîyekî dikşîne.

Heft partîyên ko nû hatine avakirin ev in:

(Hema hema çi bigre navê hemûyan wek hev in, yanî PKS-ML, PSK-LM, PTK-MLS, PKT-SLM, PLT-LSM, PTT, PTL. Ji ber wê yekê emê wek partîyên me yên Sûrîyê tenê navê serokên wan binivîsin, wê wextê hûnê zanibin cim'eta kê ye).

1-Cim'eta Hemê Horê (ji 'eşîra Îzola)
2-Cim'eta Seydoyê Hemedîk (ji 'eşîra Metîna)
3-Cim'eta 'Elîyê Bazo (ji 'eşîra Kîka)
4-Cim'eta Hemcûnê Qaçax (ji 'eşîra Menda)
5-Cim'eta Ahmedê Kewê (ji 'eşîra Jirkîya)
6-Cim'eta Bedoyê Gendo (ji 'eşîra Herkiya)
7-Cim'eta Kemalê 'Inco (ji 'eşîra Ertûşîya)
(*Berbang*, no: 57-58, 1989)

Komela mêrên bindest

Ev serê salekê ye çend mêrên bindest, xebata xwe ya ji bo heq û huqûqê mêrên bindest, bi awayekî îllegal dimeşandin. Lê meha berê êdî deyax nekirin û bi awayekî eşkere kongreya xwe çêkirin.

Nêzîkî 400 mêrên bindest beşdarî kongrê bûn. Armanca wan a ji avakirina Komela Mêrên Bindest ew e ko mêr dîsa heq û hêz û karîna xwe ya mêrtîyê bi paşde bistîne.

Piştî kefteleft û munaqeşeyên dirêj, ev kesên jêrîn ji bo komîta karger hatin hilbijartin:

Mêro Mêrzad
Şêro Repîn
Gonco Şeqîn
Ardo Pihîn
Pîlo Kulmîn

Ji slogan û şîarên wan hinek ev in:

Şêr şêr in
Hinek mê ne
Hinek nêr in!

Vî wextî vî zemanî
Ê ko ji xwe re jin anî
Wî betal kir mêranî!

Şêr şêr e
Jin jin e
Mêr mêr e!

Jin hene jinkok hene
Mêr hene mêrxas hene!
(*Armanc*, no: 124, 1992)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Yekîtiya nivîskar û yên ko bibin nivîskarên kurd li Swêdê li dar ket!

Hefteyek berî cejna Qurbanê, li bajarê Stokholma xweşik, di xanîyekî kevnik de nivîskar û yên ko bibin nivîskar hemû hatin ba hev, civcivînek li dar xistin.

Civcivînê bi hilpifandina qoltixê -pardon! yanî bi hilbijartina dîwanê-dest pê kir. Paşê jî çend kesên ji komîta lidarxistina vê yekîtîyê, raporên xebat û lebat û program û peyrew û destûra yekîtîyê xwendin.

Di raporê de li ser pêwîstîya lidarxistina Yekîtîya Nivîskarên Kurd û Yên ko Bibin Nivîskarên Kurd hat sekinandin. Û dan diyarkirin ko wan ji bo çi Yekîtî li darê xistine.

Piştî munaqeşe û pêşniyarkirina plan û rogramên 'ecêb û giran, civcivînê -ne bi darê zorê, lê- bi zorê Komîta Karrkirrr hilpifand (Wîîî, ev çi bû? Qey ez dixwazim bibêjim hilbijart!).

Eşxaszadetirînên eşrafên herî muşerrefên şexsîyetên menşûr û namîdar jî teşrîfî vê civcivînê kirin, lê zû reviyan. Ne ko zû reviyan, lê berî hilpifandina komîta kargêr bi behana cixarekişandinê revîyan.

Ew feqîrên din ên ko bi awayekî melûl û hustuxwar ji bo Komîta Karrkirr a Yekîtîya Nivîskarên Kurd û Yên ko Bibin Nivîskarên Kurd hatibûn hilpifandin û hilbijartin ev in:

Xurşo Xemşîd
Hafiz Mahfiz
Xelo Beran
Zaynir Eksamo
Ebdulqadir Qendîl
Masûr Axbandir
Şêxko Mêxko

cîgir:
Goncoyê Gordo
Hemzeyê Cerdo
(*Berbang*, no:59, 1989)

Şerê abonman û neabonmanên Armancê

Di şerê Abonman û Neabonmanên Armancê de, Neabonman bi ser ketin. Sebebê wê jî ji ber ko 152 leşkerên Abonmanan hebûn, Neabonman jî xwedîyê 788 leşkeran bûn û her weha ji dewlet û welatên din jî Neabonmanan alîkarîya hevalên xwe dikirin.

Do piştî nîvro li meydana Fireh a Stockholmê saet di 10-an de, di bin serokatîya Şakir Abonmanzade û Fettah Neabonmanzade de şerekî gelek dijwar dest pê kir.

Demek e ko serokê Abonmanan Şakir Abonmanzade bi belavok û beyanan di warê psîkolojîk de şerê Neabonmanan dikir, Neabonmanan jî bi protestoya bersivnedanê şerê xwe yê li dij Abonmanan didomandin. Lê ev şerê sar do serê sibê bû şerekî germ.

Leşkerên Neabonmanan ko 788 kes bûn, bi tang û top û tifingên xwe êrîş birin ser Abonmanan. Şerê wan sê roj û sê şevan ajot. 152 leşkerên Abonmanan li gel serokê xwe Şakir Abonmanzade her çendî bi awayekî qahremanî li ber xwe dan jî, lê mixabin li hember leşkerên wehş û hov ên Fettah Neabonmanzade deyax nekirin, bi bin ketin. Serok Şakir Abonmanzade jî ji mecbûrî reviya Sûrîyê.

Li gor agahdarîyên dawîn, Şakir Abonmanzade bi awayekî îllegal dixebite daku ji nû ve hemû Abonmanan bîne ba hev û têkoşîna xwe ya li dij Neabonmanan bidomîne.

(*Armanc*, no:125, 1994)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Kin û kurt bimre kovarmijî

Welê xuya ye ko emê jî li dij hin abonên xwe dest bi xebateke dijwar bikin ko bê pere û pûl ketine nav kompîtura me ya adresan û dixwazin xwîna -pardon - yanî kovara me bimijin.

Me hemû aboneyên xwe yên ko pere nedane tesbît kirine. Nuha emê tenê meslegên wan binivîsin. Ji xwe ew jî bi xwe dizanin.

Hinek ji wan ev in: 18 pîzzacî, yekî pubcî, 4 tixtor, 8 endamên licna merkezî ya partî û rêxistin û hizbên cûr be cûr, 12 mamoste, endamekî enstîtuyekê, endamekî komîta karger a federasyonekê, 2 asîstan, 2 doçent, 3 şa'ir, 5 gundî, 3 karker û yekî feqîr.

Ev kesên hanê dîsa li xwe varneqilin û bixwazin ko berdewam kovara me bimijin, wê wextê qetla wan helal e (Wîîî, ev çi bû, tu dibê qey mahkema şerîatê ye!). Neyse, ne qetla wan, lê eşkerekirina navê wan helal e.

Birayên hêja yên xwînmij -pardon- kovarmij!

De zû li xwe mukir werin û varqilin û perê xwe (çima perê xwe, perê me!) bişînin, çimkî kovar bi kayê dernakevin, bi pera derdikevin.

(*Berbang*, no: 61, 1989)

Studia Kurdica derket!

Axirê li dawîya dawîyê Studia Kurdica jî derket.

Di dawîya 1983-an de nivîs civandin.

Di destpêka 1984-an de nivîsên civandî daktîlo kirin.

Di dawîya 1984-an de mîzanpaja wê çêkirin.

Di destpêka 1985-an de ji bo çapê birin matbaayê.

Di dawîya 1985-an de ji matbaayê derket.

Di destpêka 1986-an de jî ji me xwendevanan re şandin û ewê di dawîya 1987-an de jî bigihîje destê me. Her çendî gehîştîye destê hin kesan, lê ew torpîllî ne!

(*) Studia Kurdica: Kovara Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ye ko bi Tirkî derdikeve, her weha Farisî û Erebîya wê jî heye.

(*Mîrkut*, no:3, 1987)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Tirr kovareke nû

Hefta berê bi navê TIRRR kovarek derket.

Me ji berpirsiyarê kovarê pirsî ko ji bo çi ev nav li kovarê kirîye û wî jî got:

— Rast e, hûnê bibêjin çima? Çimkî em ji Berbangê Berbangtirrr in, ji Armancê Armanctirrr in, ji Kurdistan Pressê Presstirrr in, ji Serdema Nû Nûtirrr in, xulase em ji hemûyan û ji we jî Tirrîntirrr in!

— Spas!

(*Berbang*, no:57-58,1989)

Tirs

Gunehkarî bêgunehîya herî mezin e. Ger tu zanî û kanî binivîse. Ger tu nizanî û nikanî dîsa binivîse. Di herdu halan de jî tu gunehkar î. Yanê sûcdar. Sûcdaran jî ceza dikin. Cezakirin jî li gor cezaker diguhere. Ji çermguranê bigre heta bi pozjêkirinê. Êdî tu û şans û serokê xwe-pardonyanê cezakerê xwe!

Lê ger tu pesnê cezakerê xwe bidî, xelas! Di merteba xwe de tu dikarî pir bilind bibî. Heta, tu yê welê bilind bibî ko êdî ev dunya wê li ber çavê te piçûûûûûûk bibe û wenda bibe. Ji xwe dunya ji ber çavê te wenda bibe, divê tu ji xwe re li dunyayeke din bigerî!

(*Armanc*, no:152, 1994)

Însan derewan dikin

Dunya çi xerîb e. Belkî jî ne dunya, lê însan çi xerîb in. Însan mehlûqatên herî bi aqil û herî bê însaf in. Heywan jî mehlûqatên herî bê aqil û bê guneh in.

Ji bo heywanan xwarin hebe bes e, qîma xwe pê tînin. Ji bo însanan xwarin hebe, tiştekî din dixwazin. Tiştekî din hebe, îcar tiştekîtir dixwazin, tiştekîtir jî hebe îcar hemû tiştan dixwazin. Hemû tişt jî hebin, îcar hevûdu dikujin. Ger kesek tunebe bikujin, îcar xwe dikujin. Lê bi ya min, dîsa jî ferqa herî mezin a di navbera însan û heywanan de ew e ku; insan derewan dikin, lê heywan nakin!

(*Armanc*, no:152, 1994)

Dewlemend û feqîr an jî feqîr û dewlmend

Axx dunya axx. Ez zanim em bi ax û waxê nagihîjin tu derekê, lê dîsa jî ax! Ûlan ax! (yanê »lawo ax!«). Ev dunya derewîn e, ji tu kesî re namîne. Tenê ji dewlemend û feqîran re dimîne. Ew jî tim bi hev dikevin. Îcar nefeqîrnedewlemend jî tunene ko wan ji hev bikin. Di esasê xwe de feqîr feqîr gotiye, dewlemend jî dewlemend. Feqîr; yanê belengaz, dewlemend; yanê gerdengaz. Dewlemend; yanê hukumdar, feqîr; yanê hukumxwar. Ji xwe dewlemendî û hukumdarî û piçekî zulumdarî ji rehekê tên. Yanê Onasis, Stalîn, Seddam û Hafiz Esad û hinekên me tevlîhev kin wê hukumdar-dewlemendek jê derkeve. Lê dîsa jî bi a min tu ferqeke mezin di navbera dewlemend û feqîran de tuneye; çimkî di qûna herduyan de jî dikare basûr derkeve.

(*Armanc*, no: 164, 1996)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ew kî ye li ser têlê?

Ax axxx! Çi dunya ye! Kultura me ya telefonê jî hatiye guhertin. Berê wexta ko me telefonî hev dikir, me digot«ew kî ye li ser têlê?« Û paşê me digot: »Hela ban filankes kin, bila ew jî were ser têlê!« an jî »ma çima Seydo nayê ser têlê?« û hwd. Lê nuha dibêjin »Elo tu kî yî?« an jî tenê »Elo!« (*Armanc*, no:152, 1994)

Mehellîstan

Beledîya Dîyarbekirê di bin serokatîya mûawînê serokê Beledîyê de grûbeke muzîkê çêkirine ko wê bi Kurdî stranan bixwînin. Di repertûwara wan de ligel stranên Kurdî yên mintiqê, sitrana Helepçe, Rabe Cotyar, Canê Canê jî heye. Beledîyê hemûyê van stranan li gel wergera wan a Tirkî dane sawcîyê (muddeîumum) Diyarbekirê daku bikaribin destûrê bigrin. Û di daxwaznameya xwe ya ji bo destûrê de jî, di şûna Kurdî de, lehçeya mehellî nivîsîne.

Bavo, bila destûrê bidin, bila navê wê lehçeya mehellî be. Ji xwe navê vî milletî her roj tê guhertin; »Tirkên Çiyayî«, »Xelkê Bakurê Iraqê«, »Etnîk«, »Rojhilatî«, »Xelkê Separatîst« û nuha jî »Mehellî«.

Yanê Grûba Muzîka Mehellî, Zimanê Mehellî, Xelkê Mehellî û welatê wan Mehellîstan.

Hela em binêrin, pêşde wê hîn çend navên din li me kin.

(*Armanc*, no: 121, 1991)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Nûgörmîş û nûlixwehaydarolmîş!

Ji alî naveroka xwe ve sewîya Kurdîya Dimilî ya ko îro tê nivîsîn hê jî negihîştîye Dimilîya berî 1980'yî ko di kovar û rojnameyên Tîrêj, DDG, Özgürlük Yolu û Roja Welat de dihatin nivîsîn.

Îcar îro hin »nûgörmîş« û »nûlixwehaydar-olmîş« rabûne dibêjin: »Berê bi Dimilî nedihat nivîsîn, cara pêşî me dest pê kirîye, em bi Dimilî dinivîsin« û bi ser de jî rabûne li gor »aqil«ê xwe »elfabeyeke nû« jî çêkirine.

(*Armanc*, no: 133, 1992)

Em û xelk

— Li Almanyayê 800 komelên Tirkan hatine ba hev, hemûyan bi hev re piştgiriya bi dewleta xwe re dane beyankirin ko şerê dewleta wan ya li dij Kurdan bi heq e, çi ji alî manewî be û çi jî ji alî maddî be, ewê alîkarîya dewleta xwe bikin.

— Ême jî dewleteke me li ber çêbûnê ye, li şûna ko em piştgirîya vê dewleta xwe bikin, ji me hinek radibin ji bo hilweşandina wê dixebitin. Goya emperyalîzm dixwaze li Rojhilata Navîn Kurdistaneke kûkla ava bike.

(*Armanc*, no:132, 1992)

Ji me re qebehet e!

Çendekî berê di gelek rojname û kovarên çep û rast ên Tirkan de xeberek li ser butçeya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê derket. Li gor xebera van rojname û kovaran; dewleta Fransa, Swêd, Swîsre û Belçîkayê alîkarîya maddî bi Enstîtuyê re kirine. Îcar xeber bi awayekî welê dane ko mirov dibêje qey Enstîtuyê alîkarî ji ciyekî pir xerab girtîye û ji bo karekî xerab bi kar tîne.

Ev serê çend salan e dewleta Tirk ji bo ko bikaribe alîkarîyekê ji dewletên Ewrûpayê bigre -ku carna digre jî- xwe diçirrîne, hemû rê û rêgayan bi kar tîne. Îcar qey ji xelkê re adet e, ji me re qebehet e?

(*Armanc*, no: 134, 1992)

Parastina ziman û edeba kurdî

— Li Almanyayê ji bo hevkari û xebata bi hev re 60 Kurd hatine ba hev. Ji biryarên wan yek jî, derxistina kovar an rojnameyeke bi Kurdi ye. Lê belavoka wan bi Tirkî bû.

— PEN'a Kurdî ko nivîskar û edîb û şairên Kurdan tê de cih girtine, belavokên wan ên ko heta îro gehiştine destê me hemû bi Tirkî û Îngilîzî ne.

(*Armanc*, no: 123, 1991)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Çekîç gûç defol yan Tûrk ordusu defol?

Gava ko Dogu Perînçek, Bülent Ecevît, Mesut Yılmaz dibêjin »bila Hêza Çakûç ji welatê me derkeve, çimkî îşxalker e« mirov wan fam dike. Ji ber ko mêjîyê wan mêjîyê îşxalkerîyê ye, îşxalkerekî din naxwazin.

Wan bi xwe Kurdistan îşxal kirine, çima li dij îşxala xwe dernakevin. Dogu Perînçek li şûna ko dibêje »Çekîç Güç Defol!« û mitîngan çêdike, bila mitîngên »Türk Ordusu Defol« çêke. Ma çêdike? Mêjî mêjîyê Kemalîstan e û li gor menfeeta xwe ya millî hereket dike.

Lê ax li wan hin Kurdên me yên ko bi nezanî an jî bi zanîn li dû wan diçin!!!

(*Armanc*, no:134,1992)

Neh cumhûriyet û elfabeyek milletek û sê elfabe

— Hemû Cumhûrîyetên Tirkan gehîştine hev û biryar dane ko ji nuha û pê de wê tenê bi elfabeya Latînî binivîsin daku bikaribin bi her awayî nêzî hev bibin, ji hev fêm bikin.

— Û hemû perçên Kurdistanê jî gehîştine hev, ko ji nuha û pê de wê bi sê elfabeyên cihê binivîsin ji bo ko ji nivîsên hev û ji hev fêm nekin.

(*Armanc*, no: 126, 1992)

Ecayîb

Çendekî berê di rojnameyeke Swêdî de xeberek derket. Mirovekî 70 salî, ev serê 14 mehan e ko di mala xwe de mirîye, haya kesî jê nebûye.

Şîrketa xênî di nav pênc-şeş mehan de çend name şandine daku ev mirov kirêya xwe bide, lê tu dengek ji mirovî derneketîye. Paşî şîrketê ew daye mahkemê, mahkemê çend name û bang şandine, lê dîsa deng ji mirovî derneketîye.

Dawîya dawî dane îcrayê, Memûrên îcrayê jî çend name û teblîx şandine, lê dîsa ne bersivek, ne xeberek. Îcar memûrên îcrayê li gel çend polîsan ji bo stendina kirêya 14 mehan çûne bi zorê derî vekirine. Lê çi bibînin, mêrikê reben mirîye. Hem jî 14 meh in ko mirîye û haya tu kesî jî jê nebûye.

Ev bûyer bi a min ji bo me ew kesên ko di panzdehê mehê de perê wan diqede û nikarin kirêya xanîyê xwe bidin fersendeke baş e. Yanê di vê civata kaxez û kompîturan de mirov dikare heta 14 mehan jî kirêya xanîyê xwe nede.

(*Armanc*, no:123, 1991)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

3 800 pakêt cixare!!!

Parlamenterekî Polonî ji ber qaçaxçîtîya cixaran li hudûdê Swêdê hatiye girtin. Ji ber ko parlamenter e, pêşî hinekî li ber xwe daye daku polîsên hudûd erebeya wî saxtî nekin. Lê polîsan derhalkê telefonî Wezareta Karûbarên Derve yê Swêdê kirine, piştî ko îzin girtine, rabûne erebeya wî saxtî kirine.

Çi bibînin? 3800 pakêt cixare! Parlamenterê Polonî girtine dane mahkemê. Li mahkemê jê pirsîne:

— Te çima ewqas cixare bi xwe re anîne, ma tu nizanî yasax e?

Wî jî gotiye:

— Min nizanîbû ko yasax e, ji xwe min wek diyarî anîn ji bo bidim parlamenter û hinek serok û berpirsên sendîkayên Swêdê..!

(*Armanc*, no: 133, 1992)

Tiştê dûrî aqila

Piştî hevqirkirina çaran, PDK û YNK li Îrlandayê li dora maseyeke çargoşe, piçekî ji hev dûr rûniştine û li hev hatine.

Lihevhatina wan baş e, lê tiştê ko neket serê min gelo ev herdu partîyên me çima weha rabûn li ciyekî ko 4-5 hezar kîlometre ji Kurdistanê dûr e, peymana nîv-aşîtîyê çêkirin? Qey li Kurdistanê maseyên çargoşe tunene ji ber wê ye!

Dewleta Su'ûdî li gor adet û toreyên xwe serê çar Tirkan birrîn, hê 40 Tirkên din jî di dorê de ne.

Dewleta Tirk jî di nav van deh salên dawîn de, wan jî li gor adet û toreyên xwe, serê 20 hezar Kurdî birrîn û pelaxtin û jêkirin, hê 20 milyon Kurd jî di dorê de ne.

(*Armanc*, no:160, 1995)

Zimanê me û yên xelkê

Zimanê me zimanekî welê dewlemend e ko hema hema berbi monopolîya mezin diçe û ger bi vî awayî biçe wê serê emperyalîzma zimên bikşîne. Divê ko li gor vê dewlemendî û pêşdeçûnê em hin tedbîran jî bigrin. Yan na di pêşerojê de wê gelek zimanên feqîrên wek Tirkî, Erebî, Farisî û hin zimanên Efrîqî ji bo ko ji bin bandorîya zimanê me xelasbin wê dest bi têkoşîna rizgarîya ziman bikin. Loma divê ko em sîlehên zimanewanî peyde bikin, mesela wek SCUD Ferheng, Nötron Ferheng, Ferhenga Atomî, Ferhenga Kîmyayî, ji bo leşkerên pîyade jî Ferhengleşkov û Ferhengtriyovan derxin.

(*Armanc*, no:160, 1995)

E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Ecaîbatên dunyayê

Hawar, Ronahî û Roja Nû ya ko Bedirxaniyan di salên 1932-1945-an li Beyrût û Şamê derdixistin wek Qura´na ezîmşah li ber serê min in, her şev ez ji xwe re dixwînim. Her cara ko ez dixwînim jî, rastî tiştekî nû têm. Îcar vê carê jî di Ronahîyê de ez rastî van adetên ecayîb ên hin milletan hatim. Welleh hema min got ezê wê ji nû ve di vê quncikê de pêşkêşî xwendevanên Armancê bikim.

— Tê gotin ko Tatarên Asya Navîn gava ko bi-xwestana mirovekî biezimandana şîvê, diçûn mala wî û bêyî ko jê re tiştekî bibêjin guhekî wî dikişandin.

— Li Çînê eger mirovek li jina xwe xe, mirovên jinikê li pêş mirovên mêrik heştê çoyî li mêrik dixin.

— Li gor adetên reşikên Afrikayî heke jinik nizanibe girarê çêke mêrik dikare wê berde.

— Misiriyên kevn zarokên xwe yên pêşîn dikuştin. Ji wan ve welê bû ko bi kuştina wî zêdehîya malbatê pirtir dibû.

— Li Tîbetê du bira ji xwe re karin jinekê bînin. Lê ger zarokên wan çê bibe, hemî li ser birayê mezin tên hesibandin.

(*Armanc*, no: 142, 1993)

Ne gotinên navdaran lê yên nav daran!

— Eskîmoyî qûlên Xwedê yên qeşagirtî ne.
— Cixare zerarê digihîne sihhetê, sihhet jî zerarê digihîne cixarê.
— Her ko însanan nas dikim, ji heywanan bêtir hez dikim.
— Ya rebbî sebrê bide min lê piçekî zû!
— Qedexekirin qedexe ye!
— Bimre nan û pîvaz, bijî goşt û birinc!
— Kes ji teralîyê nemirîye.
— Karê zengînan pere qezenckirin e, yê feqîran jî hesabkirin e.
— Bêkarên hemû welatan dev ji kar berdin.
— Ger hêk li te dikeve, tu jî li mirîşkê keve.
— Ger tu cixara xwe di qedeha çayê de vedimirînî, çaya xwe jî di xwelîdankê de vexwe.
— Her ko nivîskarên me nas dikim, dixwazim bibim xerrat!
(*Armanc*, no:130, 1992)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Çend gotinên xweşik û gulover

— Apê min ê bi guh û çavekî, diajo garana welatekî.
— Bêdengî carna tirsekî ye, tirsekî jî parçeyek ji mêranîyê ye.
— Bihara bi gulekê were, hema bila neyê.
— Bijî evîna aza, bimre qelin! - Bêkarek
— Bijî hebûnîzm, bimre rûtîzm! -Rûtek
— Bîlleheq nepên ez nayêm!- Erzanî
— Em li serokekî digerin! - Taban
— Ez bi berçavkê ranekevim, di xewnê de ez nikarim tu tiştekî bibînim.
— Ez rastî tu kesekî nehatim ko ji kêfa miribe!
— Gelo li Swêdê kurdek heye ko ne nivîskar be?
— Ger qanûn û qaîdeyên rêvebirinê tunebin, wê wextê teşqele û şer dest pê dikin.
— Golikê malê ji gayê malê natirse, lê herdû jî ji xwedîyê malê ditirsin.
— Jin bela ye, zarok jî hella hella ye.
— Ji derveyî metodên klasîk ên xwekuştinê, li rêyeke din a xwekuştinê digerim. -serokek
— Jina ko ji bin emr û fermana mêrê xwe derkeve, ew ne bindest e.
— Kengî mêr jî zarokan bînin, wê çaxê wekheviya jin û mêran biparêzin.
— Kes şîretê naxwaze, herkes pere dixwaze, dêmax pere ji şîretê baştir e.
— Li tabanê xwe digerim! -Serokek
— Ruhayî bi saya serê îsotê ji AIDS'ê filitîne!
— Tahma xwarina herî xweş li gor hebûna dirana ye.
— Wexta ko xewa min neyê, ez qahwê vedixwim.
— Xwarina bê xwê, ne şor e.
— Zebeş nîşanî serokekî Kurdan dan, got: »Ev kundir e!« Nîşanî serokekî din î Kurdan dan, got: »Na, pettêx e!«

(*Armanc*, no: 157, 1995)

Xelkê çi xweş gotiye

— Bîr û bawerîyek ko ji bo wê carna hin kes werin kuştin jî, nayê wê maneyê ko rast e. (Oscar Wilde)

— Pêşî em mecbûr dimînin em bawer bikin, paşê em bawer dikin. (G. C. Lichtenberg, 1742-1799)

— Dem ew dem e ko bi sê pêkenîn û nivîsekê mirov dibe nivîskar. (G. C. L.)

Pirs:
— Hêsan çi ye, zehmet çi ye?
Bersiv:
— Hêsan pirsên wek pirsa te ye, zehmet jî bersiva wan e. (G. C. L.)
(*Armanc*, no:137, 1993)

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Navên kurdî

Ji bo zarokên we yên ko dê nû çêbibin(bo keç û kur)
Bi amadekarîya
Romanîûs Libendeyînobelîsûs

Agirbizot
Agirpêket
Ardmalêketo
Baberda
Belqityê
Belqityo
Berxiyar
Bêderpê
Bêlome
Bindamayê
Bintûmaxa
Biserneketo
Cilo
Çavbeqo
Çavliderê
Çavnûtik
Çirya
Çogdiberde
Destçoqal
Devjiheve
Devlihewa
Devşorbe
Diranpîj
Diranqîj
Doxînsist
Erdêketo

Erdêmawo
Firnik
Fîtefît
Gonco
Guhbel
Guhdirêj
Gumegum
Guregup
Gurmîn
Gurpegurp
Gurxwaro
Herhazir
Herlibende
Herlibendê
Hûrgir
Karo
Keftar
Kefteleft
Kêmxur
Kêrto
Kojo
Kormîşk
Kûto
Kurot
Libendeyê
Limalmayê
Mellêbuharê
Nigçoqalê
Parsuxwar
Pêdirêj
Pirtenik
Pirxur
Pişтlierdê
Pişтxûz
Porgijgij
Pozqertel
Pozxwar

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Qurqurbeg
Rûqermiçî
Rûşuştî
Sîtilqûn
Têdamayê
Xûzo
Xwaro
Zikgir
Zikliser
Zimandirêj
Zimankurt
Zûxur
(*Mîrkut*, no:1, 1985)

Ev weha lê weha çawa ye?

Reşo TURAN
Hemze TURANOGLU
Ferho ÖZTÜRK
Hemo TÜRKEKUL
Îso BOZKURT
Evdo CENGÎZOGLU
Mîro KUTLUAY
Seydo ALPER
Hewê ÖTÜKEN
Sêvê KAGAN
Rindê HASTÜRK
Kewê TÜRKOGLU
Binevş BÎLGEKAGAN
Zerê ASÎLTÜRK
Bişar TÜRKKAN
Keskê TÜRKEŞ
Xatûn ALPASLAN
Şemo ERTUGRUL
Qenco SOYLUTÜRK
Tülay ZINAR

Tanju ÇIYA
Ayça POLA
Sevîm TEMO
Okay JIRKÎ
Alper BERZANÎ
Tuncay ROHILAT
Tunç BÊRTÎ
Evren SÎPAN
Denîz PILING
Türkan BRÛSK
Kutlan XELAT
Dolunay ZÊRÎN
Çîgdem ŞERVAN
Gökçe ÇETO
Güngör LEPZÊRÎN
Tuncer KURDO
Bariş MÊRXAS
Erol BERZENCÎ

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Çawa qoymîş kirine bila wisa jî çiqarmîş bikin!

Em li jorê ji oxiyîcîyên xwe re çend nav û soyadîyên gelek orîjînal sermîşî ber çavan dikin. Helbet lîsta ko me yazmîşkirîye û dizmîşî jorê kirîye ji nav hezaran nav û soyadîyên weha tenê kesimekî oliştirmîş dike.

Hun hîç duşunmîş bûne ko degiştirmîşkirina soyadîyan qolay nîne. Helem di surecekî weha de û di qoşilên îro de.

Meriv dikare navên nû, qoymîşî zaroyên nû-doxmîşkirî bike. Lê olanaxa qoymîşkirina soyadîyên nû hemen hemen hîç tuneye. Yalnizca, perê meriv hebise û tanidixên meriv yaxut jî torpîla meriv hebise meriv dikare bi mahkeme yolîyê dawe açmîşke.

Aslinde ji sahibên van soyadîyan re cîgera meriva yanmîş dibe. Feqet çi yazix kî artix Mîrkut bîlem nikare van zewallîleran qûrtarmîşke!

Wan kesên ko van soyadîyana çawa qoymîş kirine bila wisa jî çiqarmîşkin!

Bîr yandan kenîp, dîger yandan hêrsîyor musunuz?

Bîz fîkîrîyoruz kî sîz şîmdî bîr yandan kenîyorsunuz, dî¤er yandan da hêrsîyorsunuz. Lê, hêrsemenîze hîç bîr sedem yoktur.

Bîz burada ne Türk halkiyla tinazip henek edîyoruz, ne jî Türk adlariyla qerfîyoruz.

Bîr gerçe¤î carna onun ziddiyla daha îyî famiyor olmamiz, bîzî böyle bîr örne¤î nivîsîyor olmaya tamiyor. Yan na, Türklere cebren Kürt soyadlarini koymayi fîkîrmîyoruz ve onlarin ad ve soyadlarina da kenmîyoruz ve de kenmeyece¤îz.

»Tülay KURDO« gîbî bîr îsmî xwendîyor oldu¤umuzda »Kewê ASÎLTÜRK« gîbî bîr îsmîn sosretlî¤înî daha îyî fahmiyor, daha îyî hewisip hînîyoruz, daha îyî lêvarqiliyoruz.

Hêvîyoruz kî okurvanlarimiz bîzî çewt tênegihîyorlar. Jixwe aslinde burada têgihîyemeyecek bîr şey yoktur.

Bîzî biborunuz, bunu mecburen Türkçe nivîsî-yoruz.

(*Mîrkut*, no:2, 1985)

Her babet belavok, name û mesajên hazir tên firotin!

(Dîsa rojek ji rojên buhara rengîn bû. Ez û Eşref Okumuş em li Parîsê bûn. Em ji xwe re digeryan, me carê berê xwe da taxa Kurd û Tirkan. Gava ko em ji serê taxê heta binê taxê meşîyan destê me tijî bûn bi belavokan. Çimkî Newroz bû, her partîyekê belavoka xwe ya Newrozê derxistibû. Me belavok birin malê, me xwendin, çi bigre hema hema hemû wek hev bûn. Heta ne tenê wek hev, her weha wekî yên par û pêrar û pitir pêrar bûn. Îcar heşê me yê tîcarî xebitî, me got welleh hema emê belavokên hazir çêkin û bifroşin.)

Name:
— Nameyên evînê
— Nameyên serxweşîyê
— Nameyên eskera
— Nameyên pîrozbahîyê
— Nameyên ji bo Enstîtiyê

Mesaj:
— Mesajên şevên Newrozê
— Mesajên kongra
— Mesajên polîtburo
— Mesajên licna merkezî
Mesajên bi slogan: 5 wereqe
Mesajên bi sipas û silav: 10 wereqe
Mesajên îsotîn: 100 wereqe
Mesajên hingivîn: 50 wereqe

Belavok:
— Belavokên Newrozê
— Belavokên 1'ê Gulanê

E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Belavokên li ser Rojhilatanavîn
— Belavokên li ser kolonyalîzmê
Fîyeta belavokan li gor naverokê tê guhertin:
— Belavokên bi rexne: 12 wereqe
— Belavokên bê rexne: 6 wereqe
— Belavokên »Li Dunyê dûrim, Li Rojhilatanavîn Dûrim û Li Kurdistanê Dûrim«: 20 wereqe
— Belavokên damezrandin û hilweşandina rêxistin û partîyan: 100 wereqe
— Belavoka »ÇIMA VEQETYAM«: 25 Quriş.

Nimûneyek ji qalibên belavokên me:

NEWROZ PÎROZ BE! (1)

Her ko diçe Emperyalîzma Dunyê bi pêşevanîya Amerîka û dewletên din yên emperyalîst girtir, hartir û çavsortir dibe.

Emperyalîzm sîstema kapîtalîzma monopolîsta herî bilind e. Xurt e, heta qirikê çekdar e, ro bi ro qelstir dibe û nuha jî di doşeka mirinê de ye.

Li Rojhilatanavîn tu tiştek wekî berê nîne.

Her tişt tê guhertin. Wilo bi lez tê guhertin ko rojek wekî ya din, saetek wekî ya din, deqqeyek wekî ya din nîne. Helbet sedemê wê jî emperyalîzma dunyê ye.

Wekî hûn jî dizanin divê hemû sinifên karker û gelên bindest û pêşverû û welatparêz û pêşketinxwaz û antî-emperyalîst û antî-faşîst û antî-şovenîst hemû piştgirîya hev bikin û yek bin. Yan na emperyalîzm her çiqas li ber sekratê be jî, zû bi zû namire. Ji ber ko wek her tiştê wê, sekrata wê jî dirêj e.

Li Latîn Amerîka jî rewş kêm-zêde wekî li Rojhilatanavîn e.

Li Afganîstanê jixwe hûn dizanin çi dibe. Li Hîndûçînê her wisa. Li Afrîka Başûr dîsa wisa. Şerê Îran û Iraqê her dîsa wisa (2).

Îcar li Kurdistanê jî ji Meda û vir de çavsoran û weledên wan ên îroyîn û rejîmên wan tiştên nemayî bi serê me de anîn. Lê nikarîbûne dengê me bibirin.

Kolonyalîzm li welatê me ketîye her derê, lewre divê herkes vê yekê zanibe. Do çawa bû, îro jî wisa ye û dijminê me sibê jî me li hember xwe dibîne.

Li Kurdistanê îro pergala berhemîya nîv-feodal, nîv-kapîtalîst û nîv-eşîrî hakim e. Pêwendîyên berhemîyê jî her wilo ne. Avahîya ser û bin divê ji bin ve bête serûbinkirin. Û divê neyê ji bîr kirin ko têkoşîna birayên me yên Filistînî jî a me ye.

Xelasî nêz e. Emperyalîzm û xulamên wê yên kolonyalîst û hwd. li ber mirinê ne.

Bibelqite emperyalîzm!

Bibelqite faşîzm û zordestîya li ser jin û zarokan!

Bijî NEWROZ! (3)

(4).....

---

(1)-Alternatîfên din:

Bijî Newroz
Newroz hat
Newrozek din jî hat
Newroz dîsa hat
Me Newroz pîroz kir
Me Newroz bi hev re pîroz kir

(2)-Navên welatan li gor daxwazan tên guhertin, kêm û zêdekirin.

(3)-Silogan li gor daxwazê pir erzan tê dagirtin.

(4)-Navê rêxistinê ji alî xwedîyê belavokê ve tê dagirtin.

Erzûhal-Holdîng
Namenûs Belavokzade Xan, no: 99/z
Telf: 009933-44 Derveyî Welat
(*Mîrkut*, no: 3, 1987)